çîrok

FIRAT CEWERÎ



# Kevoka spî

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

# Kevoka spî

# Kevoka spî

**FIRAT CEWERÎ**

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

**Firat Ceweri:** Kevoka spî

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Firat Cewerî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-973195-4-6

Çapa kevin: Nûdem

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Nêverok

Kevoka spî ........ 7
Dilê şikestî ........ 15
Şeva sersalê ........ 23
Doktor Sertaç ........ 29
Heyştê adarê ........ 37
Stêrkek ji ezmanê me xuricî ........ 41
Xewna Orhanow ........ 43
Kêzika bênav ........ 49

# Kevoka spî

Ew pênc roj berê ji girtîgehê hatibû berdan. Digel ko emrê wî hê bi tenê sihûpênc bû jî, tayekî reş di porê wî de nemabû. Gepên wî kort bûbûn û qermîçokên rûyê wî bûbûn mîna yên kalan. Ew rûyê wî yê gewr û jîndar niha zer bûbû. Bejna wî ya dirêj ko demekê ji keçikên mehelê re mereq bû ko bidîtana, tewiya bû. Ew êdî ne xortekî berî niha bi panzdeh salan bû, bûbû mîna kalekî.

Erê, ew pênc roj berê hatibû berdan... Û niha, li qatê sisiyan, li ber pencereya odeya xwe ya xebatê rûniştibû û li derve, li barana pêşî ya payizê temaşe dikir. Car caran ji nişkê ve dikeniya, bi pistînî tiştin digotin û dîsa bêdeng dima. Ev yeka han berhema salên wî yên girtîgehê bû. Berî pênc rojan, gava ew ji girtîgehê hatibû berdan, bavê wî û merivên wî yên nêzîk bi vê yeka han hesiyabûn, loma wan ew zû nîşanî doktorekî nas dabûn, doktor tiştek jê fêhm nekiribû, bi tenê gotibû: »Divê hûn wî bibin Ankarayê«. Lê ne wî dixwest here Ankarayê, ne jî rewşa malbatê ewçend baş bû ko ew bibira Ankarayê. Rojekê jî wan pîrek ji gundekî çiyê anîbûn, da ko pîrê hin dermanan jê re çêbike û tiştekî li ser bixwîne, lê ew belkî zêdeyî deh deqîqan bi pîrê keniyabû, paşê xwe avêtibû ser pîrê, destên xwe xistibûn qirika wê û ger ne ji endamên malê bûya wî ê li wir ew pîr bixeniqanda. Pîra ko bi zorê xwe ji nava lepên wî filitandibû, di derî re derketibû û bi xurtbûna xortekî bazdabû.

Barana ko dihat carinan xurt dibû, carinan mirov digot qey wê dawî were, kêm dibû, lê dîsa bi xurtî dibariya. Wî jî herdu enîşkên xwe danîbûn ser masê, serê xwe xistibû nava kefên destên xwe û bêyî ko çavên xwe bikutkutîne li barana pêşî ya payizê dinihêrî. Carinan dixwest dilopek baran ji hewa de heta ko bigihîje erdê taqîb bike, lê hew dinihêrî ko dilopin din diketin ber wî û bala wî dîsa belav dibû. Ew cerekê jî li hebûna baranê fikirî. Wî ew perçeewrên reş yên li ezmên şiband deryayeke weke moxilê biqul. Di wê navê de dîsa ew pîrika wê rojê hate bîra wî. Ew dîsa mîna wê rojê bi pirqîn û bi dengekî bilind keniya. Paşê bi carekê ve kenê xwe birî. Çavên wî beloq bûbûn. Wî ew çavên xwe yên

beloq bera ewr dabûn. Erê, rast bû, di nav ewrê reş de kevokeke spî xuya dikir. Ew kevoka spî her ko nêzîk dibû mezin dibû, her ko mezin dibû dişibiya xweha wî. Erê, ew xweha wî bû. Wî bi çavên xwe didît.

Vê carê enîşkên xwe ji masê hilanîn, bi herdu destan xwe hişk bi masê girt û ziq li xweha xwe nihêrî. Kirasekî tenik li xweha wî bû, guliyek ji dehfên hespan li eniya xwe girêdabû û li ber pencereya wî difiriya û dixwest di pencerê re têkeve hundir. Gava mêrik ev yeka han ferq kir, hema ji cihê xwe pengizî û pencere vekir. Bi vekirina pencerê re xweha wî firiya hundir. Digel ko li derve baran xurt dibariya jî dîsa keçik şil nebûbû. Çavên keçikê mîna du morîkên şîn dibiriqîn û lêvên wê yên dagirtî di rengê sorbûna hinarîkên riwê wê de bûn. Bejna wê dirêj, newqa wê zirav û hêtên wê dagirtî bûn. Ew bi wî awayî li quncikeke odê li ser lingan rawestiyabû, baskên xwe bera ber xwe dabûn, stûyê xwe xwar kiribû û bi rewşa birayê xwe digiriya. Wê digot:

— Keko ev çi bi te hatiye? Birayê mino kanî xortaniya te? Te çima xweha xwe kuşt? Çawa destên te li min geriyan û te ez kuştim? Çawa destên te li xweha te, ya ko te ewqasî jê hez dikir, geriya?

Axx... Min çi bêriya te kiriye. Axx... Ez çi dixwazim te hemêz bikim. Ez çi dixwazim birayê xwe tayê bi tenê hemêz bikim. Ez çi dixwazim rohnîka çavên xwe hemêz bikim. Kekê mino, bavê mino, birayê mino... Lê ez nikarim. A niha destên min bi te bibin ez ê winda bibim. Ji ber ko ez mirî me, te ez kuştime... Axxx... Kekê mino, min çiqasî ji te hez dikir. Ma nayê bîra te gava em li ser daweta te dipeyivîn? Te ji min re digot, divê tu serê govendê bikişînî. Ma tê bîra te kekê mino? Tê bîra te bê ji daweta te re çiqasî hindik mabû? Piştî te ez kuştibûm bi salekê dergîstiya te jî xwe avêtibû ber tirênê û xwe kuştibû. Tam hûn ê wê rojê bizewicyana û min ê wê rojê serê govenda birakê xwe, tayê bi tenê bikişanda. Tam wê rojê dergîstiya te bûbû mêvana min. Wê ji min re behsa rewşa te kiribû û wê gotibû piştî ko te ez kuştibûm, tu hatibûyî girtin. Wê jî îdare nekiribû. Ji derdê evîna te xwe avêtibû ber tirênê û miribû. Zû de ye haya min ji wê tuneye. Ji wê şeva ko em bi hev re li girtîgehê hatibûn xewna te û pê ve min ew nedîtiye. Ger ew bibihîze tu hatiyî berdan, ew li ko be ew ê were. Me çend caran bi hev re xwest em werin seredana te, lê gardiyanan em ditirsandin, em ji wan newêrîbûn bihatana. Dergîstiya te her li te difikire. Wê roja ko hatibû mêvandariya min, ji min re gotibû, bi çi awayî dibe bila bibe, ez ê xwe bigihînim wî. Wê zewac li herdu dinyan li xwe heram kiriye. Ew li ser te dîn bûbû kekê mino, ew tenê ji bo ko te ez kuştibûm


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hebekî ji te qeherî bû. Lê roja ko mêvana min bû, min jê rica kiribû, ko kekê min efû bike. Wê jî soz dabû min ko ew ê te efû bike. Min jê re gotibû, çi dibe, birakê min tayê bi tenê ye, wî efû bike. Min gotibû, birakê min guneh e, pir diltenik e. Min gotibû, birakê min heta îro gêrikek neêşandiye, lê ez kuştime, xem nake, ew jî ne sûcê wî bû kû... Xelkê lê wilo kir. Ger xelkê li te wilo nekiriba te ê ji kû xwaka xwe bikuşta? Wê ji kû destê te li min bigeriya? Min ji dergîstiya te re got, gava te bera min dabû, te çavên xwe girtibûn. Min got, destên wî li min nedigeriyan. Min got, wî pir ji insanan hez dikir. Û min got, te ji min jî pir hez dikir. Ma ne wilo ye? Qey te ji min hez nedikir? Ma tu ji min hez nakî kekê mino?

Xilolîkên hêsirên çavên mêrik di ser riwê wî yê nekurkirî de gêr dibûn ser çena wî û paşê dinuqutîn erdê. Êdî ew mîna zarokekî bi îskîn digiriya. Wî dixwest serê xwe deyne ser milê xweha xwe û bi dengekî bilind bigirî. Dixwest uzra xwe jê bixwaze. Dixwest jê re bibêje ko wî çiqasî bêriya wê kiriye. Dixwest poşmaniya xwe bîne ziman.

Xwe winda kiribû. Ber bi xweha xwe çû, ko wê hemêz bike, lê xweh li ber geriya û jê re got, ko destê wî pê bibe, ew ê winda bibe. Lê mêrik xwe negirt, xwe avêtê; bi avêtina wî re keçik winda bû. Mêrik deverû, li hundirê odê kete xwarê û bi ketinê re serê wî li qorziya masê ket û serê wî mîna ko perçe bûbe, xwîn jê hat. Ew bi şikandina serê xwe nehesiyabû.

Heya ko diya wî ket hundir, bi qêrîn bang cîranan kir, hingê ew hêdî hêdî, mîna ji xeweke kûr şiyar bibe, bi ser hişê xwe ve hat û têgihîşt ko li erdê ye.

Ew barana ko di pencerê re li hundir xistibû, kaxiz û pirtûkên li ser masê şil kiribûn û av herikîbû ser tej û xaliyên raxistî.

Bi alîkariya cîranan ew rakirin nexweşxanê, doktoran, ko yek jê hevalê wî yê zaroktiyê bû, serê wî pansûman kirin, bi xavikekê girê dan û ji bavê wî re gotin, da wî rakin Ankarayê, an jî ko îmkanê wan hebe, wî bibin Ewrûpayê. Bavê wî ji bêîmkaniya xwe gazin kir û ji bo bikaribe alîkariyekê ji cihekî bistîne, ji doktorê hevalê lawê xwe daxwaza hin şîretan kir. Doktor jî soza tiştê ko jê bê dayê û bi rewşa hevalê xwe yê zaroktiyê, ko ewçend zîrek û jêhatîbû, xemgîn bû.

Zîrektî û jêhatîbûna wî ji aliyê herkesî ve dihate zanîn.

Berî panzdeh salan, di îmtihana tibbê de, ew di nav sed û pêncî hezarî de yê şêstemîn derketibû û ew hevalê wî yê ko niha li nexweşxaneya bajarê wan doktorî dikir bi zorê bûbû yê hezarî. Wî hê di salên xwe yên lîseyê de piraniya klasîkên fransiz û rûsan xwendibûn û di qayişkişandina

çîrokan ya rojnameya bajêr de bi çîroka xwe ya bi navê »Mêrikê Serxweş« bûbû yekemîn û paşê ew çîroka wî li Ewrûpayê ji aliyê hevalekî wî ve li almanî hatibû wergerandin û niha jî ew çîrok di antolojiyeke bi nave »Edebiyata Rojhilat« de li Almanyayê ji aliyê weşanxaneyeke naskirî ve hatiye çapkirin. Herkesî bi vê zîrekbûna wî dizanîbû. Heta, apê wî, yê ko reîsê belediya bajêr bû û gelekî jê hez dikir, soz dabûyê ko dê wî ji bo stajê bişîne Îngîltereyê. Lê gava kurtûpista ko wî di bin tesîra apê xwe de xweha xwe kuştiye, li bajêr belav bûbû, pir kesan bawer nekiribûn û ji bo ko dilê xwe têxin cih, ew bi hin karkerên belediyê re peyivîbûn. Karkerên belediyê jî nedixwestin diyar bikin ko serokê wan bûye sedema vê trajediyê, wan tenê bêdengî dipejirandin. Li gora dihat gotin û di nava bajêr de belav bûbû, çîrokê wilo dest pêkiribû: Xweha wî ya ko bi xweşikbûna xwe di bajêr de deng dabû xwestiya pismamê xwe bû. Biryara wê xwestinê jî hê di pêçekê de ji aliyê herdu biran ve hatibû dayin; lê herdu zarokên ko di aliyê karekter de gelekî dûrî hevdu bûn û ew pismamê ko ji aliyê keçikê ve qet nedihat hezkirin û hebandin, ketibû derê riya wê. Keçikê jî hewesa xwe berdabû ser xortekî cîranê mala xalê xwe û rojekê gava êdi têdigihên ko tu riyên din tuneye, bi hev re baz didin. Ji bo şopê ji ser xwe dagerînin û nekevin dest, her gav cihê xwe diguherin, tu carî zêdeyî şevekê li cihekî namînin, lê piştî sê mehan, li Îzmîrê, li barkêşekî nas rast tên û barkêşê ko bi tesadufî bi reva wan hesiyabû û xelata ko apê keçikê ji bo girtina wan soz dabû, bihîstibû, timayî zora wijdan biribû û ji malbata keçikê re xeber şandibû, ji aliyê din jî bi dek û dolab û bi dostanî bi dû herdu dilketiyan ketibû û gava rojek ji rojên havînê ya herî germ ew bi apê keçikê, bavê wê û du pismamên wê re ketibûn hundir, herdu dilketî şaş û ecêbmayî mabûn, lêwik hema destê xwe avêtibû destê hezkiriya xwe û xwestibû bazdin, lê apê kêçikê, yê reîsê belediyê bû û bi laş û gewde bû, hema xwe avêtibû qemçika paş stûyê lêwik, ew ber bi xwe ve kişandibû, paşê heta jê hatibû ew ber bi dîwêr ve dehf dabû, pişta wî li dîwarê çimento xistibû, lawik bi belqîn vereşiyabû, lê hîn berî ko ew bigihêje bi pişta destê xwe devê xwe pakij bike, vê carê lawê reîs, yê ko di nav malê de gelekî delalî rabûbû, lê pir tirsonek û ji aliyê laş û gewde jî de qet nelihev bû, heta jê hatibû kulmek li ser çavê lêwik xistibû. Keçikê îdare nekiribû, êrîşî wan kiribû, gava apê wê xwestibû lêxe, destê wî gez kiribû, di wê kêlîkê de barîna ko ji apê wê hatibû bêtir barîna gayekî anîbû bîra mirov. Lê herdu dilketiyan herçiqas li ber xwe dabûn jî, dîsa nikaribûn xwe ji nav destên wan bifilitînin, heta ko tarî ketibû erdê ew bi dest û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

lingên wan ve girêdabûn, ew avêtibûn dawiya dolmîşê û hezar û dused kîlometre, digel ko tenê sê caran sekinîbûn, çûbûn. Di sekinandina cara çaran de, lêwik xwe bi awayekî vekiribû, weke guleya devê tivingê xwe di derî re avêtibû, xwe avêtibû dû pîqabek ko nuh ji benzînxanê hereket dikir û çûbû. Her çiqas hin ji van bi dû pîqabê de bazdabûn jî, pere nekiribû; pîqab zû derketibû ser rê û bi sureteke xurt ji wir bi dûr ketibû. Apê keçikê pîlaqa pîqabê nivîsandibû û ji mêrikê kal yê li ber benzînxanê pirsa wê pîqabê kiribû. Mêrikê kal heqê benzîna xwe jê stendibû, bi neyînî serê xwe hejandibû û pirsa wî bê bersiv hiştibû. Ew li dolmîşa xwe siwar bûbûn, ji benzînxanê derketibûn û piştî sê saetan, saet donzdeh û nîvê şevê gihîştibûn bajêr. Di ketina bajêr de gava dewriye di rê de li wan rast hatibû û dîtibû ko reîsê belediyê ye, silav lêkiribûn û bêyî ko li dolmîşa wan saxtî bikin ew berdabûn. Wan jî rast ajotibûn ber deriyê mala bavê keçikê, pismamê wê bi guliyê wê girtibû, ew ji dolmîşê derxistibû, di hewşê de bi dû xwe de kişkişandibû û biribû avêtibû hundir. Gava diya wê ji xew şiyar bûbû, keçika xwe ya mîna guleke bêstirî di wê rewşê de dîtibû, xwe negirtibû, xwe avêtibû ser wê, lê bavê keçikê çend pehîn li wê xistibûn, jê re gelek xeberên ne li rê dabûn û bi bazdana keçikê ew jî sûcdar kiribû. Paşê zilaman keçik di nav xwe de hilgirtibûn, ew biribûn xaniyê banî, ji nû ve girê dabûn, derî li ser wê kilît kiribûn û sê roj û sê şevan ne avek ne jî pariyek nan dabûnê. Dotira rojê mala apê wê ji birayê wê yê li Stenbolê re telefon kiribûn, lawik bi balafirê hatibû, li wê rewşê şaş mabû, pêşî bawer nekiribû, dû re gava apanê wî xistibûn serê wî û xwestibûn ko ew namûsa xwe pakij bikin, di nava xelkê de dîsa weke berê bi serbilindî bijîn, jê re demançeke çekî ya ko destikê wê ji aliyê zîvkerekî asûrî ve hatibû neqişandin, peyda kiribûn û xwestibûn ko ew bi destê xwe, wê dêlika xweha xwe bikuje. Pêşî lêwik qebûl nekiribû, herçiqas dixwest xweha xwe biparêze jî ji ber hin sedeman newêrîbî. Ew bûyera ko di nava bajêr de belav bûbû, ji bo malbata wan ya naskirî kêmaniyeke mezin bû. Û ji bo ko dîsa rûyê malbatê spî bibe, şeref û namûsa wan bi dest bikeve, kuştina keçikê pêwîst bû. Lêwik jî bi vê yeka han dizanîbû. Loma kuştina xweha xwe qebûl kiribû, demançe ji apê xwe stendibû, du caran ketibû hundirê oda xweha xwe, jê nîşan girtibû, lê dîsa jî destên wî lê negeriyabû, bernedabûyê, tenê li ser lingan rawestiyabû û ziq li xweha xwe nihêrîbû. Xweha wî jî stûyê xwe xwar kiribû, bi porê xwe yê jihevdeketî û bi rewşa pîreke çîrokî li birayê xwe nihêrîbû. Ne wê, ne jî birayê wê tiştek ji hev re negotibûn. Roja sisiyan gava birayê wê şev nîvê

şevê bi şidet derî vekiribû, xweha xwe li ser lingan di qorzîka odê de dîtibû.

Gava xweha wî çav li wî ketibû, mîna ko zanibe ew ê vê carê were kuştin, bi birayê xwe re keniyabû. Ew hingê li ber çavên birayê xwe bûbû weke pîrhebokekê. Lawik ji wê rewşa wê bêhawe tirsiyabû, weke ko tu satilek av bi ser de birijînî di xwêdanê de mabû. Çavên wî weke du bizotên êgir sor bûbûn û beloq bûbûn û bi qêrînekê re bera xweha xwe dabû. Gulleya pêşî ko berdabûyê mêjiyê wê ji hev belav kiribû û ji ber ko berra eynî cihî dabû, lê keçik bi gulleya pêşî re çokên wê fisiyabûn û hêdî herikîbû erdê, her heft gulleyên ko berdabûnê li eynî cihî ketibûn.

* * *

Êvarî, gava wî xwe bi serê girêdayî li ser nivînê xwe dirêj kiribû û ziq li zikê odê dinihêrî, ew li wê yekê difikirî. Li salên xwe yên girtîgehê difikirî. Gelek serpêhatiyên wî hebûn. Ew bi gelek kesan re rabûbû û rûniştibû. Gelek kesên naskirî dîtibûn. Ji bo derbaskirina wextê xwe û ji bo ko ew xwe ji bîr bike gellek pirtûk xwendibû. Paşê rewşa wî xerab bûbû, destê wî li xwendina pirtûkan sar bûbû, wî seredanên ko dihatin bi paş de vedigerandin, heta demek pir dirêj bi heval û dostên xwe yê girtîgehê re jî nepeyivîbû. Ew li vê yekê jî difikirî. Paşê ji nişkê ve rabû û li ser xwe rûnişt. Piştî kurtedemekê jî çû odeya xwe ya xebatê. Berî panzdeh salan gava hîn berî ev bobelat bi serê wan de were, rewşa malbata wî ya aborî pir baş bû. Ji bilî xaniyê wan yê sêqatî, sê dikanên wan yên kincan jî li bajêr hebûn. Ew odeya xebatê bi tenê ya wî bû. Ew çû, dîsa li ber masa xwe rûnişt, herdu enîşkên xwe danîn ser masê, serê xwe xist nava kefên herdu destên xwe û ji pencerê li derve nihêrî. Ev yeka han ji roja ko ew hatibû berdan jê re bûbû mîna adetekê. Ji nişkê ve çavên wî beloq bûn û li dûr nihêrî. Erê, ew ne şaş bû, ya ko ji dûr ve xuya dikir û xwe li wî girtibû û bi firîn dihat xweha wî bi xwe bû. Lawik hema ji cihê xwe pengizî û pencere vekir. Xweha wî di pencerê re ket hundir û dîsa çû quncika xwe ya berê.

— Min ji te re gotibû, kekê mino, got. Min ji te re gotibû, ko destên te bi min bibin ez ê winda bibim. Niha divê tu destên xwe bi min nekî. Ger tu destên xwe bi min bikî ez ê dîsa winda bibim.

Carekê mîna ko winda bû lê dîsa xuya bû. An jî mêrik wilo hîs kir. Vê carê ziq li hêla xweha xwe nihêrî; dît ko erê, rast e, ya ko xwe di quncika


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xênî de kiriye qomik û stûyê xwe xwar kiriye, xweha wî ye. Xweha ko berî niha bi çend deqîqan bi kirasekî spî û tenik bû û rûyê wê gewr û hinarîkên wê sorik bûn, niha li ber çavên mêrik bûbû mîna berî bi panzdeh salan; porê wê ji hevdeketî, kirasê wê qetiyayî, zeyif û bêhêz. Loma mêrik ji nişka ve kire qîrîn û bi qîrînê re jî çend caran li ser hev got: »na, na!« Bi dengê qêrîna wî re dê û bav û xwişkên wî yên biçûk şiyar bûn, lê gava dîtin ko tiştek tuneye dîsa çûn cihên xwe. Lê diya wî pencera oda wî girt, ew li ser mînderê da dirêjkirin, demekê li ber serê wî rûnişt û serê wî yê ko di rengê berfê de bû, mist da. Wî jî eynî weke zarokekî biçûk serê xwe danî ser çonga diya xwe û herdu congên xwe kişandin zikê xwe. Diya wî gunehê xwe bi wê rewşa lawê xwe anî û ew lawê wê yê ko weke çiyayekî bû, lê niha ketibû wê rewşa xerab, dil û cergê wê disot. Ew demekê li zaroktî û xortaniya lawê xwe fikirî û ew keçikên mehelê ko ji bo lawê wê yê çeleng çiqasî xatir û qîmeta wê digirtin, bi bîr anî. Her ko diya wî serê wî mist dida, wî jî xwe hîn bêtir weke zarokekî hîs dikir û hêsirên çavên wî weke dilopan diherikîn erdê. Diya wî jî ji bo ko hêsirên wê neherikin ser riwê lawê wê, bi destmala serê xwe hêsirên xwe pakij dikir û nifirên dinyayekê li mala apanê wî dikir. Mala apanê wî ko demekê tade û neheqiyeke mezin li wê kiribûn û ew apê wê yê ko bûbû sedema kuştina keça wê û bûbû sedema ko kurê wê têkeve wê rewşê.

Wê, nifir li wî apî dikir. Wê di dilê xwe de nifirên xwe dikirin. Wê digot, te warê min kor kir, Xwedê warê te jî kor bike. Wê digot, te mala min xerab kir, Xwedê mala te jî xerab bike. Wê digot, Xwedê ava reş bi çavên te de bîne. Wê digooot û digot.

Mêrik piştî demeke kurt li ser çonga diya xwe di xew re çûbû, lê diya wî ji bo ko wî şiyar neke, heya saet sisê şevê bêyî ko xwe tev bilivîne, di bin serê kurê xwe de rûnişt. Lê heya êdî ji ber tevizandina lingê xwe debar nekiribû, mecbûr mabû kurê xwe, ji bo ko ew here ser nivînê xwe razê, şiyar kiribû. Lawik jî ji nişkê ve ji xewê pekiyabû û ew xwêdana ko ji tesira xewna wî ya tirsê mabû bi pişta destê xwe pakij kiribû. Diya wî bi destê wî girtibû, ew biribû oda wî ya razanê, ew li ser nivînê wî dirêj kiribû, rûyê wî maçî kiribû, lampa wî vemirandibû, hêdîka deriyê wî girtibû û derketibû. Yê mêrik jî xewa wî nehatibû, piştî derketina diya xwe bi nîvsaetekê rabûbû ser xwe û dîsa çûbû oda xwe ya xebatê. Çer ko ketibû hundirê oda xwe ya xebatê pencera xwe vekiribû, lê dîsa girtibû, paşê dîsa vekiribû. Vê carê ji nişkê ve ji hundirê odê dengek hatibû. Mêrik veciniqîbû, li paş xwe zîvirîbû, dîtibû ko dîsa xweha wî li quncika odê

stûyê xwe xwar kiriye û dixwaze ji birayê xwe re tiştinan bibêje. Birayê wê jî hebekî berepaş çûbû, li quncika din ya odê li ser kursiyekê rûniştibû û wî jî bi stûxwarî li xweha xwe nihêrîbû. Carekê, mîna niqutî dilê wî ko ew ne xweha wî ye, bi tenê li ber çavên wî wilo dibe, lê weke xweha wî dizanîbû ew çi fikiriye, loma zûka ji wî re gotibû:

— Ez xweha te me, bavê mino! Ez Sorgulê me. Ez niha ji ba dergîstiya te têm.

Mêrik dîsa jî baş lê nihêribû, ew xweha xwe ya berî bi panzdeh sal û çar–pênc mehan anîbû bîra xwe, dîtibû ko tu guhertin di xweha wî de çênebûne, ew spehîbûna xwe ya berî bi panzdeh sal û çend mehan hîna jî parastiye.

— A îro min dergîstiya te dit. Wê got, ger tu herî silavên min lê bike, jê re bibêje, ez li benda wî me, ez ji wî pê ve kesî nakim, bila ew jî kesî neke. Wê dixwest bi min re were, lê nehat, wê got, jê re bibêje, bila ew were. Wê got, ma ne heqê min e ko ew were min bibîne. Min jê re got, belê, heqê te ye, ez ê herim kekê xwe bînim û werim. Ew niha haziriya me dike, ew niha li benda me ye, çavên wê li riya me qerimî ne. De heydê kekê mino, heydê em herin.

Niha xweha wî çûbû ber pencerê, herdu destên xwe avêtibûn pencerê û ji birayê xwe re, yê ko dîsa hêsirên wî di ser riwê wî yê bi rih de diherikî re digot, »de haydê em herin«. Keçik di pencerê re derket û çû. Dengê wê ji dûr ve di guhên mêrik de dikir zingînî: »Tu jî bide dû min keko, ez li benda te me!…«

Merik jî herdu destên xwe avêtin pencerê, hilkişiya ser û xwe bi dû xweha xwe de avêt.

* * *

Sibehê zû, gava mele ji mizgeftê vegeriya malê, ji dûr ve dît ko yek li kuçê dirêjkirî ye, kûçik û cewrikek li dora wî diçin û tên û lingên wî bêhn dikin.

Her ko mele nêzîktir bû, fêhm kir ko ew lawê cîranê wan e. Gava wî xwe avêtibû, pêşî li ser zik ketibû, paşê qulupîbû ser piştê. Nîvê riwê wî yê çepê nemabû, mêjiyê wî rijiyabû erdê. Melê ew çend mêşên rengkesk yên ko dikirin vingînî, dane alî û bi destmalka xwe riwê wî nuxumand.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Dilê şikestî

Ew saet sisê şevê hat malê. Hêdî, bêî ko kesî şiyar bike derî vekir û ket hundir. Tesîra vexwarinê ji ser wî çûbû, lê dîsa jî hebekî dihejiya. Wî bi wê hejandina xwe çakêtê xwe ji xwe kir, bi dar de kir û bêî ko lampê vêxîne derbasî odeya xwe ya razanê bû. Jina wî ya ko ji êvar de xew neketibû çavan; her li benda wî mabû û xwe bi derewan li xewê danîbû, bêhngirtin û bêhnberdana xwe jî mîna yeke ko di xeweke kûr de be, girt û berda. Mêrik jî bi fikira ko wê ji xew şiyar neke, hêdî pantolonê xwe ji xwe kir, paşê gomlek jî ji xwe kir û ew avêtin wê rasta odê. Dû re bêdeng xwe li ser nivîna, li paş jina xwe dirêj kir. Bi ketina mêrik ya nava nivîna re, mîna ko jinik ji xewê şiyar bibe, xwe vezeland, bi derewa bawişkî û bi dilekî xerab ji mêrê xwe pirsî:

— Tu hatî?

Mêrikê ko bêhna araqiyê jê dihat û wê şevê qet dilê wî û munaqeşê tunebû, bi dengekî nizim got:

— Erê.

— Ma saet çend e?

Wextî mêrik derew bikira û saet şaş jê re bigota, lê gava çavên wî li saeta li ser masê, ya ko di tarîtiyê de sor dikir, ket, mecbûr ma rastiyê bibêje:

— Saet sisê ye.

Jinikê bi xwe dizanîbû ko saet sisê ye. Ji êvar de çavên wê ji wê saeta li ser maseya oda razanê neqetiyabûn.

— Tu heta niha li ko bû?

— Ez bîskê çûbûm mala Ehmed. Ji wir jî em çûn komelê.

— Ma komele heta vê saetê vekirî ye?

— Ma min got, komele?

— Erê, te got, komele.

— Na keçê, em neçûbûn komelê, em çûbûn mala Osman.

— Hûn çûbûn mala Osman?

Mêrik ji westandinê nizanîbû çi dibêje, ji xewê pê ve tiştek nedihat bîra wî. Wî dixwest kurt bibire û ji xwe re rakeve.

— Niha ez çûbûm ko, neçûbûm ko, ji te re çi lazim e?
— Çawa ji min re ne lazim e?
— Keçê dev ji min berde, ez bêxew im, ez ji xwe re rakevim.
— Tu bêxew î ne, çima na?
— Keçê, dev ji min berde! min ji te re got.
— Ez dev ji te bernadim. Te îşev çi kiribe divê tu ji min re bibêjî.
Mêrik bi kenekî ne ji dil got:
— Keçê, ma ez ê çi bikim?
— Tu dizanî tu çi dikî.
— Niha tu dikarî buhtanan jî têxî stûyê min.
— Na herê, melayiketên nola te dikarin çi bikin.
Mêrik dîsa kenekî ne ji dil, kenekî xav kir:
Bi wî kenê wî jinik qeherî, îcar bi dengekî hebekî bilind got:
— Ger tu ê vê bi min bikî, min bişîne welêt çêtir e. Ez hew dikarim îdare bikim, bes e ji derdê te!
Mêrik demekê xwe li razanê danî, lê nebû; gotinên jina wî yên bi hêrs û bi gazin qet firsend nedidayê ko razê. Wî bi xwe jî bi vê yekê zanîbû, loma bêî ko lampê pêxîne, destê xwe dirêjî ser maseya nêzîka qeryole kir, rahişt pakêta xwe ya cigarê, cigarek jê derxist, pêxist û çend hilmên kûr li ser hev lê xistin. Jinik li benda wî bû ko ew tiştekî bibêje, lê gava deng jê derneket, dîsa wê got:
— Ez zanim tu dîsa çûyî ba wê qehpikê, wê qehpika qûnmezin...Wê qehpika araqvexwir, wê qehpika ko nîvê bajêr bera ser xwe dide...
Mêrik bi sert peyva wê birî:
— Wek kûçikan mereye! Zimanê xwe weke yê kûçikan dirêj meke!
Jinekê jî bi hêrs bersiv da.
— Ger ne wilo be, bêje, ne
wilo ye!
Gava mêrik bêdeng ma, jinikê dîsa got:
— Erê, ma ne wilo ye?
— Na, ne wilo ye! mêrik bi hêrs got.
Jinik êdî baş hêrs bû, her tişt da ber çavan.
— Wê çaxê ez ê jî bi riya xwe de herim, wê bi dengekî bi bawerî got.
Mêrik fêrî wan gotinên wê bûbû, vê carê jî ew cidî negirt:
— Tu bi ko de dicehemî biceheme, got û berê xwe jê guhert da ji xwe re razê.
— Ez ji te re dibêjim, jinikê got. Ger tu dev ji van awayên xwe bernedî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ez ê herim. Ez hew deqîqekê li vê malê disekinim. Ez ê zarokên xwe bibim û herim.

Mêrik pir westiyabû, hêdî di ber xwe de got:

— Here...

— Ez ê herim, jinikê got, ji nav nivîna hol bû û lampe pêxist. Mêrikê ko xwe hê jî tevnelivandibû, dîsa hêdî di ber xwe de got:

— Keçê, vê şevê dev ji min berde...

— Ez ji te re rast dibêjim, jinikê bi dengekî bilind û nîvgirî got.

Bi dengê wê re zaroka wan ya biçûk ji oda kêleka wan giriya. Gava dengê zarokê hat mêrik, mêrik ji nav nivînê xwe rabû, şîmaqek bi hêz li ser çavê jinikê xist û hin çêr ji dê û bavê wê re kirin.

Di wê navberê de zarokên wan yên din jî rabûn, lê bavê wan bi ser wan de qîriya û zarok dîsa bi paş de çûne odên xwe.

Saet dihat çaran, tarîtiya şevê hêdî hêdî cihê xwe ji ronahiyê re dihişt. Mêrikê ko ji ser ya xwe danediket, kirinên xwe rast didîtin û li kesî din guhdarî nedikir, vê carê jî dixwest bi ya xwe bike. Lê jina wî jî, ya ko bi a wî gelekî bi înad bû, ji ser ya xwe danediket.

Wê her çiqas dizanîbû piştî sê zik zarok hevduberdan ne hêsan e jî, dîsa biryara xwe dabû, ko mêrik careke din vê yekê bikê, ew ê dev jê berde. Çend caran ew efû kiribû û mêrik jê re sond xwaribû, ko ew êdî hew tiştên weha dike. Lê wî tu caran sonda xwe bi cih netanî, piştî du-sê rojan dîsa ji mal winda dibû. Tew carinan jê ew bi şev jî nedihat malê. Şevên ko dihat malê jî, mîna îşev saet di sisê, an jî çarê sibehê de dihat.

Mêrik cigareke din pêxistibû, li ser qorziya qeryole rûniştibû, serê xwe berjêr kiribû û difikirî. Jinikê jî herdu destên xwe xistibûn bin çengên xwe û li derve, li xaleke nexuyayî dinihêrî.

Paşê jinikê berê xwe bi mêrê xwe ve kir; serê mêrik hê jî di ber wî de bû û kûr kûr difikirî. Ji dilê jinikê dihat ko wî bide ber kêran û bikuje lê dikir nedikir nikarîbû jê nefret bikira. Her çiqas hin jinên hevalên wê ew şîret kiribûn û jê re gotibûn, dev ji vî mêrî berde jî, wê dikir nedikir ne dikarîbû dev ji mêr berdaya, ne jî gava mêr lêdixst, dikaribû li wî gilî bikira. Lê îşev kêr gihabû hestî, hatibû heta qirika wê. Ji xwe dilxerabiya ko îşev pê girtibû bûbû mîna gulokek mar û ketibû zikê wê. Ji dil bêtir zikê wê dêşiya. Hezkirina mêrê wê ya li hemberî wê keçikê, gotinên xweş ko ji keçikê re digotin, pê re razana wî, hemû dihatin ber çavên wê.

Gava ew li tiştên wilo difiki

rî dêhn dibû, aqilê xwe winda dikir. Vê carê jî wilo bû:

— Serê xwe mîna yê pîrekan nexe ber xwe, jinikê ji mêrê xwe re got û jê pê ve nizanibû wê çi bibêje.

Mêrik hêrs bû, lê wî jî tiştek negot, di cihê xwe bêdeng ma.

Jinik dîsa peyivî:

— Îcar ji te weye ew qehpik ji te hez dike? Ew qehpika ko nîvê bajêr bera ser xwe dide. Wê qehpika pîs û qûnmezin...

— Keçê bes e! mêrik got.

— Ne bes e!

— Bes bireye!

— Ez bes nakim! Divê îro her tişt safî bibe!

— De tu çi gûyî dixwî bixwe.

— Ji mala min here! jinikê got. Bi wê heramiya xwe nekeve nava nivînê min! Nivînê min neherimîne!

Mîna ko mêrik bi sûcê xwe hesiyabe, deng nekir. Lê jinikê rahişt pantolon û gomlegê wî, bi hêrs avêtin ser wî û got:

— Ji mala min here, here ba wê qehpikê!

Mêrik ji cihê xwe pengizî û rabû jinikê; kê dera wê kete ber wî, lêxist. Ne got çav e, ne dest e, ne serî ye, ne pişt e; hema ko dera wê diket ber wî, lêdixist.

Her ko wî lêdixist, jinikê jî dikir qîrîn û digot. Hersê zarokên wan şiyar bûbûn, hatibûn oda wan, ji tirsan xwe li hev pêçabûn û bi îskînî digiriyan. Ne haya dê, ne jî haya bavê ji zarokan çênebûbû, ew her bi hevdu re mijûl bûn. Nizanim çi li serê jinikê xistibû, serê jinikê şikandibû, ew xwîna ko ji serê wê dihat li ser kincên wê û li hundirê odê belav bûbû.

Hîn ew wilo ji hev neqetiyabûn, hebe tunebe, wê cîranê wan ji polîsan re telefon kiribe, di demeke pir nêzîk de, otomobîla polîsan bi sureteke xurt hat, li ber deriyê wan sekinî û du polîsên dirêj, bi navmil, digel kûçikekî xurt û şiyar, bi lez xwe ji otomobilê avêtin û bi êrîş çûn hundir. Bi fikira ko belkî mêrik li hemberî polîsan rabe û tiştekî bi kar bîne, polîsekî demanca xwe jî kişandibû.

Lê mêrik li hember polîsan ranebû, mîna ko dizanibû wê polîs destên wî kelemçe bikin, herdu destên xwe dirêjî polîs kirin. Polisekî bi lez destê wî kelemçe kir, ew da pêşiya xwe û ew ber bi otomobîlê ve bir. Paşê yek ji wan polîsan dîsa bi paş de vegeriya hundir, herçiqas birîna jinikê ne birîneke xedar bû jî, polîs ji ambûlansê re telefon kir û heta ambûlans hat, pirsên ko ji jinikê pirsîbûn, di deftera xwe de not girtin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

* * *

Mêrik du mehan di girtîgehê de ma, meha sisiyan gava hat berdan, jinikê doza hevduberdanê lê kir û ew bi biryara mehkemê ji hev hatin berdan û zarok û xanî jî para jinikê ketin. Mêrik jî çû ba keçikê. Keçika ko ji bîst û du saliya xwe nuh ketibû bîst û sisiyan li nexweşxanê hemşîretî dikir. Meha pêşî gelekî xweş bi hev re derbas kirin, gelekî ji hev hez dikirin… Ji kêfa evîna hevdu re herdiwan jî hefteyekê ji cihê karê xwe îzin girtin û bi hev re çûn Lanzeroteyê. Ew bi şev û roj ji hev têr nedibûn. Ji çend saetên xwarinê û ketina avê ne têde, wekî din ew her bi hev şa dibûn, hevdu mist didan, bi hev re radizan.

Ne rojek, ne du roj, ne sê roj, wextê wan hefteyekê her wilo bi kêf, bi zewq, bi evîn û xweş derbas bû. Piştî ko ji tatîlê vegeriyan bi hefteyekê jî têkiliyên wan wilo xweş bûn. Lê êvarekê gava keçik ji kar hat malê ne wek hertim bi kêf bû. Gava mêrik xwest wê hemêz bike û maçî bike, keçikê bi sarî ew maçî kir, cara didiwan wê berê xwe jê guhert. Sarbûna keçikê tavilê bala mêrik kişand. Lê berî ko mêrik tiştekî bibêje, wê got:

— Divê tu ji xwe re xaniyekî bibînî. Ez dixwazim bi tenê bimînim.

Mêrik sar ma. Te heft xencer lê bixista piça xwînê jê nedihat.

Ev çi bû îcar? Ma ne wan ji hev re soz dabûn, ko ew ê bi hev re bimînin û sala bê jî bi hev re herin Krêtayê, li wir destgirtî bibin û li wir du hefteyên xweş û bi şahî bi hev re derbas bikin. Ma qey keçikê ev hemû tişt ji bîr kiribûn?

Du-sê rojên din jî bi hev re man, lê ji hev gelekî sar, an jî keçik jê gelekî sar bû. Her çiqas mêrik dixwest wê hemêz bike an wê maçî bike, keçikê xwe bi paş ve dikişand an jî carê ji xwe re mijûliyek peyda dikir da ko ji mêrik rizgar bibe. Di hundirê wan du-sê rojan de jî tenê carekê bi hev re razan, ew jî ne ko jinikê dixwest, hema hema bêjin bi zorê bû.

Gava mêrik xwe da erdê û nexwest ji mala keçikê bar bike, keçikê jê re du roj mudet da û got ko ew vê carê bar neke ew ê ji polîsan re telefon bike û dê wî bi zorê ji malê derêxe. Ji ber ko mêrik gelek salan li Swêdê mabû û bi qanûnên Swêdê û azadiya jinan dizanîbû, ji xwe re zû ji destê dudan xaniyekî xwendevanan peyda kir û barkirê. Lê piştî ko bar kir jî her keçik azad nedihişt; bi roj bûya, bi şev bûya, ji keçikê re telefon dikir û her carê ko telefon dikir jî nêzîkî nîvsaetê dipeyivî. Her çiqas ji keçikê re digot: »çawa hezkirina te wilo dawî hat?« bersiva ko keçikê didayê jî her »ez dixwazim bi tenê binînim« bû. Ji bo ko keçik jê pak bibe û êdî hew dengê wî bibihîze, wê nimra telefona xwe jî guhert. Vê yeka han tesîreke

ecêb li mêrik kir, dinya bi ser wî de hilşand. Her tişt li ber çavên wî reş bûn. Du sê rojan zor da cigarê û vexwarinê; hefteyekê neçû kar; dikir nedikir keçik ji bîrê nediçû.

Rojekê, danê nîvro gava li otobusê siwar bû, dît ko destê keçikê di destê xortekî ji Emerîka Latînî de ye û li ber camekana dikanekê rawestiyane û li kincan dinihêrin. Heta otobus li kuçê zîvirî jî wî di ser stûyê xwe re li wan nihêrî.

Heya bi çar pênc mehan bi zorê wî hebekî ew keçik ji bîr kir. Lê tenêtî çiqasî nexweş bû. Bi tenê razê, bi tenê rabe. Bi tenê bixwe, bi tenê vexwe. Carinan jê wî bi saetan xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, çavên xwe bera nixteyekê didan û wilo bêdeng dima. Ger wilo dom bikira ew ê şerpeze û dîn bibûya.

Şev nîvê şevê rabû ji kevnejina xwe re telefon vekir. Jinik bi dengê telefonê ji nava nivînan pekiya û bersiv da:

— Elo…

— Elo, ez im…

— Xêr e tu vê şevê telefon dikî?

Her çiqas panzdeh salan bi hev re mabûn jî, dîsa wan çend mehan ew ji hev bi dûr xistibûn; mêrik nikanîbû mîna berê serbest pê re bipeyiviya. Vê carê lawik kir sebeb:

— Min dixwest ez bi Temo re bipeyivim:

— Temo niha razaye û wê sibehê zû rabe here mektebê, tu dikarî sibehê piştî mektebê telefon bikî. Şev baş!

Jinikê telefon di rûyê wî de girt. Ev yeka han pir li zora wî çû, lê neda xuyakirin. Bîskekê xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, paşê cigarek pêxist; piştî ko cigara xwe kişand, dîsa telefon vekir.

— Keçê qet nebe em bîskê bipeyivin.

— Em ê çi bipeyivin? jinikê got.

— Li ser rewşa me

— Rewşa çi?

— Ma nabe ko em dîsa werin ba hev?

— Ez niha rehet im, dev ji min berde.

Erê jinikê wilo got, lê qet nebe ji bo zarokan bûya jî wê dixwest careke din bigihên hev.

— Keçê meriv carekê şaşiyê dike.

Jinikê dizanibû ko ew niha hewcedarî wê ye. Gava yek zeyif dikive, yê din xurt dibe. Jinikê jî xwe di wê deqîqê de pir xurt û bi hêz hîs kir.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Wê şevê belkî zêdeyî saetekê bi telefonê bi hev re peyivîn. Her çiqas mêrik xwest wê şevê here malê, yanî here mala jinikê jî, lê jinikê nexwest û piştî wê bi du rojan bi alîkariya hin malbatên din ew dîsa li hev hatin. Ne ji wan bêtir be jî, bi qasî wan zarokên wan jî kêfxweş bûn.

Bi xwestina jinikê wan ji wî bajarî bar kirin û çûn li bajarekî din bi cih bûn. Mêrikê ko bi xwe hem li welêt, hem jî li Swêdê mamoste bû, dev ji mamostetiyê berda, bi hevalekî xwe re ko ew jî li welêt avûkat bû, lê li Swêdê li ser sosyalê dijiya, restorantek vekirin. Restoranta wan ko îro yek ji restorantên bajêr ya herî baş e, bi xwarinên xwe yên kurdî navdar e.

## Şeva sersalê

Berî şeva sersalê bi hefeyekê, hevalekî Alan jê re telefon kir û xwest ji bo pîrozkirina sersalê bi hin malbatên din re li malekê li hev bicivin û ji xwe re şeveke şahiyê çêbikin.

Herçiqas Alan li ser riya Parîsê bû û bilêta xwe ya çûyîn û hatinê birrîbû jî, dîsa hevalê wî ew ji rê bir û nemaze ji bo ko wê Metîn Cansever jî beşdarî şeva şahiyê bibûya, xwest ko Alan jî ji wê şevê nemîne û ji salê carekê şeveke wilo xweş û bi reng bi hev re pîroz bikin.

Alan bi xwe navê Metîn Cansever çend carên din li hin cihên din jî bihîstibû. Lê li her cihekî bi awayekî behsa wî hatibû kirin. Ji bo Alan firsenda dîtina vî kesî nerevîne û qet nebe bi nas û hevalên xwe re di şeveke wilo de li hev bicivin, hema bi lez bilêta xwe ya balafirê, digel ko hinek pereyên Swêdî zêde bide vegerand, piştî wê bi rojekê bi telefonê li hevalê xwe geriya û ji bo beşdarbûna xwe ya şevê ew haydar kir. Hevalê wî yê ko ji eynî bajarî bû û li welêt muhendîz bû, lê li Swêd di restorantekê de firaxşoyî dikir û wextê xwe yê vala bi çêkirina resiman ve derbas dikir, bi nûçeya ko wê Alanê beşdarî şeva şahiyê bibe, pir kêfxweş bû.

Êvara sersalê nêzîkî panzdeh kesan li mala hevalê Alan civiyan. Digel ko piraniya beşdarên şevê navsal bûn jî hê ew nezewicî bûn. Jinên du hevalan jî weke her sal îsal jî çûbûn welêt. Ji jina mazûbên û du keçikên swêdî pê ve tu jin tunebûn. Ew herdu keçikên swêdî jî hevalên du beşdarên civînê bûn. Lê ew zêde neman, hîn berî ko Metîn Cansever were, wan xatir ji hevalên xwe xwestin, li ser lingan tiştin ji hev re gotin û çûn.

Metîn Cansever piştî hemiyan hat. Qatek kincên reş û gomlegekî spî li xwe kiribû, qerewata reşbelek bi ser de girê dabû û hê ji dûr ve bêhneke xweş jê difûriya. Piştî ko silav da civatê û ji bo derengmayina xwe ji nas û hevalên li wir uzra xwe xwest, bi nermî xwe da ser kursiyê.

Lixwekirin, nazikî û kubariya Metîn Cansever tavilê bala Alan kişand. Loma, bêî ko ew haya kesî bigihînê, wî xwe nêzîkî Metîn Cansever kir û hêdî çû û li ba wî rûnişt.

Piştî ko hemiyan bixêrhatinî dan hev, xwe bi hev dane naskirin û bi

noşîn çend qedeh li hev xistin, Metîn Cansever hêdî di ser stûyê xwe re zîvirî û bi dengekî nizim ji Alan pirsî:

— Ma xorto tu zûde hatiyî Swêd?

Alanê ko qet nebe bi sê-çar salan ji Metîn Cansever mezintir bû, bi nazikî bersiva wî da:

— Piştî du mehên din deh salên min têne dagirtin.

Metîn Cansever rahişt qedeha xwe ya şerabê, bilind kir, lê nihêrî, du-sê gulp jê vexwar, lêva xwe ya jêr mêt, serê xwe hinekî hejand û bi axînkişandineke bêdeng dîsa ji Alan pirsî:

— Tu qet neketiyî, tu çend salî yî?

— Ez çil û sê salî me, Alan got.

— Pirs ne eyb be tu çend salî yî?

— Yê min tu lê nepirse.

Metîn Cansever dîsa rahişt qedeha xwe, vê carê li ya Alan xist, tiştê ko di qedehê de mabû bi ser xwe dakir û ji Alan pirsî:

— Tu çi karî dikî?

— Ger kar bête hesab, ez rojnamevan im, Alan got.

Metîn Cansever dîsa qedaha xwe dagirt, qurtek jê vexwar û bi dengekî nizim peyva xwe domand:

— Min jî demekê rojnamevantî dikir, lê karê doktoriyê ez li paş hiştim. Niha xebata min li ser romanekê heye. Roman li ser jiyana romantîkekî kurd e, ko di sedsala nozdehan de jiyaye û ji malbateke ronakbîr û têgihiştî ye. Min roman bi kêmanî deh caran nivîsandiye û xerab kiriye. Tam deh salên min girt. Lê çi fêde, roman derkeve jî kurd jê fêhm nakin. Ji bo têgihiştina romaneke wisa kultureke bilind lazim e. Lê tu a rastî bixwazî, ez vê ne ji bo kurdan dinivîsim, min bêtir berê xwe daye Ewrûpiyan. Ji xwe berî kurdiya wê, dê ji aliyê du hevalên min yên nivîskar bi fransî û îngilîzî derkeve.

Hevalê Alan yê ko li kêleka Metîn Cansever rûniştibû, herdu guhên xwe miç kiribûn û li sohbeta wan guhdarî dikir. Gava Metîn Cansever li vê yeka han hayî bû, xwest peyvê dagerîne ser tiştekî din, lê mazûbên bi ken jê pirsî:

— Ka ew pirtûka te derneket lo?

— Na welle, hê derneketiye. Mîratê xebateke dûr û dirêj jê re divê. Ji bo bidestxistina hin delîl û malûmatan divê ez herim Misrê û Sûriyê. Lê destên min ne vala ne, wergerandina hin klasîkan di destên min de hene. Ez niha bi wergerandina Tolstoy û Dostoyevskî ve mijûl im.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Her ko şev derengtir dibû, hewa sohbetê ewçend germtir û xweştir dibû. Li ser masa mitfaxê û ya oda rûniştinê tije xwarin û vexwarinên pirtexlît bûn. Hemiyan bi kêf dixwarin, vedixwarin, dipeyivîn, dikeniyan. Û cigare… Wan cigare ji cigarê pêdixistin. Wilo bûbû ko ji dixana cigaran çavan çav nedidîtin. Ji bo hênikkirina hundir û ji dixanê pakkirina odê çend caran pencere vekirin jî, lê dîsa ji ber nexweşiya Metîn Cansever tavilê girtin.

Bi lêdana saet donzdehan wan şûşeyeke şampanya vekirin. Yê ko şûşe vekir mirovekî navsal, bejindirêj, hebekî rûdagirtî, porspî û ji der û dora Diyarbekirê bû. Bi saloxan, wî di dema xwe de bingeha partiyekê avêtibû û di partiyê de jî karekî girîng girtibû ser xwe. Ew du-sê caran jî hatibû girtin, lê dîsa zû hatibû berdan. Li gora hevalên ko ew nasdikirin, spîbûna porê wî ne nîşana biaqiliya wî bû

Piştî ko wî qedehên hemiyan dagirt û bi noşîn qedehên xwe li hev xistin, wî destekî xwe xist bêrîka xwe, destê din jî danî ser masê û peyivî:

— Gelî hevalan, lihevkombûna me ya îşev rojek ji rojên welêt tîne bîra min. Ew rojên xweşiyê, yên şahiyê. Lê şîreta min li we, ji siyasetê bi dûr bikevin. (Destê xwe danî ser porê xwe) Min ev por di siyasetê de spî kiriye. Min tam bîst salên xwe dane siyasetê. Ka min çi kir? Ka çî min heye?

Xortekî ko li quncikê rûniştibû û ta bi wê deqîqê deng jê derneketibû, rabû ser xwe û xwest peyva wî bibire, lê xwediyê malê çav dayê û ew da rawestandin.

Mêrikê diyarbekirî her got. Ew geh hêrs dibû, bi dengekî bilind dipeyivî, geh jî dengê xwe dadixist, nerm dibû û bi bergerîn digot. Wilo bû ko êdî hew kesî guh dayê. Hinan gotin: »Serxweş e, dev jê berdin, çi dibêje bila bibêje«. Hinek jî rabûn, xwestin bi milên wî bigirin û wî bavêjin der, lê dîsa xwediyê malê nehişt û ew dane rawestandin. Pir tê re neçû, mêrikê me yê Diyarbekirî xwe li quncikeke xênî avêt erdê û hema li wir di xew re çû.

Metîn Cansever jî êdî ji şerabê derbasî wîskiyê bûbû. Qedeha wî ya wîskiyê di destê wî de bû û li ber tabloyeke Picasso, Guernica, ya ko xwediyê malê ji afîşekê çarçive kiribû û bi dîwêr ve kiribû, rawestiyabû û kûr kûr lê dinihêrî.

Wê yeka han dîsa bala Alan kişand, wî jî rahişt qedeha xwe, rabû û çû ba Metîn Cansever.

— Çi ji Picasso dikeve serê te?

— Picasso hosteyekî nemir e. Ne kesî berî wî mîna wî xweş çêkiriye, ne kes dikare piştî wî mîna wî xweş çêbike.

— Navbera te û Salvador Dali çawa ye?

— Digel hebekî dînbûna wî û têkiliyên wî yên bi Lorca re, dîsa jî ew surealîstekî xurt û mezin e.

Alanê ko qet nebe hin klasîkên dinyayê xwendibûn, di wê deqîqê de xwe li ber Metîn Cansever pir biçûk û nezan dît. Wextî di dilê xwe de bigota »bi rastî va ye întelektuel ji nava me derdikevin« lê weke Metîn Cansever di dilê wî de be, peyv jê girt:

— Lê, pismamê Alan, ka ji me çi derketiye?

Dîsa berê xwe bi tabloya Picasso vekir

— Ka kî ji me dikare tabloyeke wisa çêbike?

Hebekî sekinî, dîsa got:

— Ka kî ji me dikare mîna Franz Kafka binivîsîne?

Wext bûbû derengê şevê, digel derengiya şevê, dîsa civatê kaseteke govendê danîbû ser, bi besteke xweş û bi dilşahiyeke mezin dîlanên kurdî digirtin. Yên ko nedireqisîn jî, bi stran û çepikên xwe govend geş dikirin.

Xuyabû ew vexwarina ko Metîn Cansever ji êvar de vedixwar tesîr lê kiribû. Ne ko serxweş bûbû, lê zêde dikeniya, zêde dipeyivî û her behsa muzîk û edebiyata dinyayê û behsa modernîzmê dikir. Paşê ji nişka ve li govenda geş zîvirî û bi dengekî bilind got:

— Hela bes e bavo, we xwe kuşt!

Lê govendê her bi ya xwe kir.

Paşê ew li xwediyê malê zîvirî:

— Ka tu ji kereme xwe re ji me re muzîkeke klasîk deyne ser; Mozart, Bethoven…

Wextî xwediyê malê bigota, ev hewa ne ya muzîka klasîk e, lê dîsa jî ji bo ko dilê wî nehêle, ji mêvanên xwe yên din destûr xwast û sêlikeke Mozart ya ko di erzaniyê de kirî bû, da ser.

Xuya bû wê sêlikê dawiya şeva wan a şahiyê tanî. Hem ji ber derengbûna şevê û tesîra vexwarinê, hem jî ji ber ji bo wan nexweşbûna wê muzîkê, di wê bîskê de çend heb ji wan bawişkîn.

Metîn Cansever jî kirî di xew re biçûya, lê ji bo ko di çavên beşdarên şevê de kêm nekeve, bi alîkariya herdu destên xwe rabû ser xwe, yek bi yek destê xwe da wan, destûra xwe û çûyinê ji wan xwest û ber bi derî ve meşiya.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Alan û hevalê xwe jî pê re çûne ber derî. Metîn Cansever hêdî, bi cangiranî paltoyê xwe li xwe kir, pêlavên xwe xistin pê û bîskê jî li ser lingan peyivîn. Paşê, berî ko derkeve, destê xwe da xwediyê malê, destê wî bi dostanî guvaşt, spasên xwe ji bo şevê jê re got û hin rexne jî li organîzekirina şevê girt. Li gora ko xwediyê malê Metîn Cansever nas dikir, ew rexneyên wî gelekî normal dîtin û bi devkenî ji bo sersala bê, soza organîzekirinek baştir dayê.

Metîn Cansever di wê navê de hejiya û wextî biketa, lê Alan bi lez ket bin milê wî.

— Haa, min wextî tu ji bîr bikira, wî bi dengekî mîna yê serxweşan ji Alan re got. Tu ket serê min. Tu xortekî jîr û zîrek î. Binivîsîne, lê nûjen binivîsîne! Dev ji tiştên kevin berdin, bibin Ewrûpayî. Metîn Cansever bi wî awayî hejiya, derket û çû.

Ew berfa hûr û bayê xurt yên ko ji êvar de dihatin, êdî dawî hatibû û cihên xwe ji berfa gir re hiştibûn. Kuliyên berfê li ber şewqên lampên kuçan weke minminîkên spî li ba dibûn.

Metîn Cansever stûkura paltoyê xwe bilind kiribû, herdu destên xwe xistibûn bêrîkên xwe, di nava kuliyên berfê de bi hejandin dimeşiya û di ber xwe de stranek digot:

Hatasız kul olmaz
Hatamla duy beni
Dermansız derd olmaz
Derdimle duy beni

## Doktor Sertaç

Berî hevdîtina Doktor Sertaç û mamosteya unîversîteyê ya fakulteya edebiyatê Perwînê bi rojekê, Dr. Sertaç ji bo kirîna qatek kinc saet ji nehê sibehê heya bi çarê piştî nîvro bêî ko raweste û bêhna xwe berde, li dikan û mixazeyên Diyarbekirê geriya. Ew diçû kîjan dikanê jî nîvê qatên kincên wan li xwe dikir û ji xwe dikir. Rebeno ne mexsûs wilo dikir, bi rastî jî tu kinc lê nedihatin; hemû an jê re teng bûn an jî dirêj bûn. Qatê dawî ko li dikana dawî li xwe kir, hebekî lê dihat lê rengê wî rengekî pirr ecêb bû, kêfa Doktor qet ji wî rengî re nehat. Bi niyeta belkî biecibîne çend caran li ber neynikê çû û hat jî, dîsa nekete serê wî, ew rengê mîna xweliyê qet ew venedikir.

Piştî ko wî çakêt ji xwe kir, ji dikandêr pirsî:

— Qatekî din di vê mezinahiyê de, lê rengekî din tuneye gelo?

Dikandarê ko temenê wî li dor bîstî bû, bejinzirav, dirêj û zerik bû, carekê du caran di ber qatên kincan re çû û hat, paşê ji Doktor Sertaç re got:

— Belê Welle, gerek qatekî din jî di wê mezinahiyê de hebûya, ger şansê te hebe ew ê nehatibe firotin.

Dikandar li wî qatê kincan geriya negeriya nedît. Lê dû re qatekî din ji nava kincan kişand, dirêjî Doktor Sertaç kir û got:

— Ev bi du numreyan jê biçûktir e. Lê ev malê Îskoçya ye. Numrên îskoçî carinan ji yên me mezintir in. Ka tu ji kerema xwe re vî li xwe bike, dibe ko li te bê.

Doktor Sertaç ew qatê kincan ji destê dikandar girt û bi cangiranî li xwe kir. Rengê qêt xweşik bû, lê qet lê nedihat; wî ne dikarîbû bişkokên çakêt bigirtana, ne jî bişkokên pantolon. Doktor Sertaç bi eynî cangiraniyê ew jî ji xwe kir û da dikandar.

Ji westandinê ew êdî nikarîbû li ser lingan rawestiya; li ser kursiya dikandar rûnişt û bi destmalka xwe ya kaxezî xwêdana ser çavê xwe û ya eniya xwe ya rût pakij kir.

Doktor Sertaç yekî kurt û dagirtî bû. Ji dagirtîbûnê jî wêdetir qelew bû.

Li gora hevalekî wî ko ji min re behs kiribû, ew du caran ji bo wê qelewbûna xwe emeliyat bûbû, lê dîsa jî fêde nekiribû. Piştî emeliyata dudan ji ber sedemin nenas îcar porê wî weşiyabû. Ji ber weşandina porê xwe wî qelewbûna xwe ji bîr kiribû.

Piştî ko dikandar ew hemû kincên ko ji bo wî derxistibûn bi dar de kirin, kirî erza wî bişikanda û bigota: »Ma ev der çayxane ye ko tu li vir rûdinî« lê Doktor Sertaç berî wî peyivî:

— Min digot belkî karê doktoriyê tenê zehmet e, karê we jî ne rehet e.

Gava dikandar têgihîşt ko ew doktor e, bi nermî û bi devkenî jê pirsî:

— Ma tu tiştekî venaxwî, çayekê an tiştekî sar?...

— Belê Welle, tu ji kerema xwe re ji min re coca-colayekê bixwaze.

Dikandar bi dostanî destê xwe li paş stûyê lawikê şagirt ko temenê wî li dor deh salan bû û ji dirêjbûna porê xwe bêtir li keçikekê çûbû, xist û ji bo xwastina coca- colayê ew şand çayxaneya herî nêzîk.

Lawik zû digel coca-cola û qedehekê vegeriya û ew li ser masê, li ber Doktor Sertaç danî.

Doktor Sertaç coca-colaya xwe berda qedehê, qedeh nîvî kir û hinek jê vexwar.

Paşê li saetê nihêrî; saet dihat çaran. Piştî çend saetên din wê piraniya dikanên kincan bihatana girtin. Lê diviyabû Doktor Sertaç ji xwe re qatek kinc bikiriya. Ji ber ko çi cara wî û mamosteya fakulteya edebiyatê Perwînê hevdu dîtibûn, her carê ew kinc lê bûne. Loma wî biryar dabû ko vê carê bi qatek kincên nû û xweşik derkeve hemberî Perwînê.

Piştî ko wî vexwarina xwe vexwar, ji dikandêr pirsî:

— Wekî din tu mixaze li van nêzîkan tuneye gelo?

Dikandar cihek got, lê dûr bû, li aliyê bajêr ê din bû.

Doktor Sertaç rabû ser xwe û dîsa di ber kincan re çû û hat; destê xwe dirêjî qatekî kir û ji dikandar pirsî:

— Gelo min ev jî li xwe kiribû?

Dikandar çû ser kursiyê, ew qatê kincan ji jor daxist, hêdîka ew toza ko lê girtibû dawşand û dirêjî Doktor Sertaç kir. Doktor Sertaç ew qat jî mîna qatên berê di pişt perdeyeke biçûk de li xwe kir, ji pişt perdê derket, di ber neynikê re çû û hat; piştî ko baş li paş û pêşê xwe nihêrî, di ber xwe de kir niçe niç û got:

— Ev tam li gora min e, lê milên çakêt dirêj in.

Dikandar bişkokên çakêt girtin, milên çakêt bi qasî ko dirêj bûn lê wergerandin û piştî ko du-sê caran li dora wî zîvirî û lê nihêrî, got:



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Milên wî ne tê de lê wekî din tam li gora te ye. Ger tu bixwazî, terziyekî me heye, ez dikarim lêwik bişînim ba wî, ew ê ji te re di nîvsaetê de milên wî lê wergerîne û tu qet ferq jî nakî.

Ew yeka han ket serê Doktor Sertaç, bi kêf, lê bi cangiranî ji xwe kir û da dikandêr. Dikandêr jî ji lawikê şagirt re tarîf kir, jê re xist kîsikekî naylon û ew şand ba terzî.

Saet li dor çar û nîvan lawik ji ser terzî vegeriya. Xortê dikandar ew xweşik pêça, xist kîsikekî nû û ji Doktor Sertaç re danî ser masê.

Doktor Sertaç rabû ser xwe, dîsa bi destmala xwe ya kaxizî xwêdana ser çavê xwe û ya eniya xwe ya rût pakij kir, paşê destmala xwe xist bêrîka xwe ya hundir, cûzdanê xwe derxist, buhayê ko dikandar jê re gotibû, bêî ko bazar bike pere hejmartin destê wî, rahişt qatê kincên xwe, bi devkenî xatir ji dikandar xwest, derket û çû.

* * *

Ji ber ko ew êvarî her li Perwînê fikirîbû û dereng raza bû, adinî rojê dereng ji xew rabû. Hûn ya rastî bixwazin, razana wî bi tenê ew çend saetên dawî bû. Heta saet sisê sibehê, ew bi kêmanî şeş caran şiyar bûbû û her cara ko şiyar bûbû jî, hem li saetê nihêrîbû, hem jî çûbû daşirê avek rijandibû.

Ji bo ko miriyê xewê bû û ji tirsa ko ew ê di xew de bimîne, bi tas û was nivistibû, her xewn dîtibû. Ji bilî xewna ko wî di emeliyatê de bi şaşî nexweşekî xwe dikuşt, xewna Perwînê jî dîtibû. Dîtibû ko mamosteya fakulteya edebiyatê Perwînê, destê wê di destê mamosteyekî fizîkê de ye û di nav daristaneke bê ser û dawî de mîna du zarokên dilşa dibezin. Di xewnê de gelekî dilxerabî pê re çêbûbû, lê gava wilo dereng, saet yanzdehan ji xew rabûbû û dîtibû ko xewn e, bêhna wî hatibû ber wî û ji ber ko dilxerabî mirovan biçûk dike, ew ji ber wê xewna xwe hebekî li ber xwe jî ketibû.

Li gora lihevkirina wî û Perwînê, wan ê li mala Doktor Sertaç hevdu bidîtina. Herçiqas Doktor Sertaç xwestibû wê biezimîne restoranteke û li wir xwarinekê bi hev re bixwin jî, lê Perwînê li hember derketibû û bi fikira ko ji diyarbekiriyan re nebe mijara kurt û pistê, wê mala Doktor Sertaç çêtir dîtibû û ji bo wê hevdudîtinê jî pêwîstiya tu xwarinê nedîtibû. Doktor Sertaçê ko ne bi dilekî lê bi heft dilan dil ketibûyê, dîsa jî li gora germa Diyarbekirê hê ji doh de hin xwarinên sivik amade kiribûn, ser

wan naylon kiribûn û ew di sarincê de bi cih kiribûn.

Saet ta bi donzdehan jî hê Doktor Sertaç xurîniya xwe nekiribû. Wî ne bi tenê xurîniya xwe nekiribû, herweha ne riha xwe kurr kiribû, ne jî mîna ko her sibeh dikir, serê xwe şuştibû.

Saet donzdeh û pênc deqiqeyan rabû ser xwe, ji navê û bi jor ve tazî û bi zikê xwe yê ko weke merşekê pê ve daliqyabû, çû daşirê, piştî ko ji daşirê vegeriya, deriyê sarincê vekir, qutîka şîr bi ser xwe da kir, ji ber ko devê qutîkê bêduzen vekiribû, hin ji şîr rijiya ser wî, ew şîrê ko bi ser wî de rijiya, herikî ser zikê wî yê mezin û di ser zikê wî re jî dilop bi dilop niqutî erdê.

Doktor Sertaç bi hêrs ew qutîk xist sarincê, bi piste pist xeberin da û bi paçikekî ew şîrê ko rijiyabû erdê pakij kir.

Ji do êvarî de nihêrîna saetê jê re bûbû wek nexweşiyekê, dîsa li saetê nihêrî,

— Wextê me hê pir maye, wî di ber xwe de got.

Û weke ko ji nişkê ve pirsek an jî tiştek hatibe bîrê bi lez ber bi pirtûkxana xwe ve çû, pirtûkek stûr û bi reng ya di derheqa tibbê de bû ji nava refên pirtûkan kişand, li ser linga pelên wê di ser hev re qulupandin, nêzîkî li nêvî kir, li wir tiştin xwend û paşê ew pirtûk dîsa bi paş de xist cihê wê. Lê îcar ansîklopediyeke ko bi tîpa »K« dest pê dikir ji nav pirtûkan kişand, li ser dîwanê rûnişt û pelên wê jî di ser hev re qulipandin. Wî tu carî bendek an jî stûnek bi temamî nedixwend. Hûn ya rastî bixwazin, ji xwendinê bêtir, ji bo ko ew wextê xwe derbas bike wî li wêneyên pirtûkê dinêrî.

Saet çar û nîvê piştî nîvro, gava li deriyê Doktor Sertaç ket, wî hê xwe hazir nekiribû. Baş bû yê ko li derî xist ne Perwînê, lê parsekekî kal, rihdirêj û pişttewiyayî bû. Doktor Sertaçê ko bi kurkirina riha xwe ve bilî bûbû û gwîzan li cênîka xwe ya çepê xistibû, bêyî ko bihêle Kalo zêde bipeyive û duan bike, du pelên kaxizî ji çavîka masê kişand û xist mista kalo.

Kaloyê ko herdu çavên wî mîna du morîkên hêşin di nava wê riha wî ya spî de diçûrisîn, bi dua û selewatan ji mala Doktor Sertaç bi dûr ket.

— Em ji derdê van parsekan mirin, Doktor Sertaç di ber xwe de got. Diyarbekir bûye cihê parsekan.

Paşê dîsa çû serşokê û bi kurkirina riha xwe ya ko nêvcî mabû ve mijûl bû. Bi gwîzanê ko berê pê cênîka xwe ya çepê birî bû, vê carê jî nizanim çawa kir, qirika xwe birî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ji ber senhetê xwe û şarezabûna xwe ya birînkewandinê, Doktor Sertaç tavilê bi derman û pembo ew xwîna han da rawestandin. Lo heya ko wî riha xwe kur kir, ew ji hal de ket.

Her carê ko wi gwîzan li riwê xwe dixist, ji ber kobûna gwîzên, çêr û xeberên dinyayekê dikir. Ji ber wê yekê, ew gelekî poşman bûbû ko ew neçûbû ser berber.

Gava dawiya kurkirina riha xwe anî û çavên wî li saetê ket, saet bûbû pêncê piştî nîvro. Wextê ko wî û Perwînê dabûn hev jî, di navbera pênc û pênc û nîvan de bû.

— Normal gerek ew di pênc û nîvan de were, Dokto Sertaç xwe bi xwe got.

Û bi rastî jî mamosta Perwîn tam di pênc û nîvan de li deriyê wî xist.

Doktor Sertaç bi pantolonê xwe yê nû, bi kêf, lê hebekî bi heyecan derî vekir. Mamosta Perwîn weke hercar vê carê jî desteyek kincên sivik li xwe kiribû. Kincên wê ji yên jinekê wêdetir weke yên mêrekî bûn. Wê bi wî awayî solên xwe ji pê kirin û ji tûrikê xwe, ko mîna tûrikên şivanan bû û bi sê gulîkên bi sê rengên cihê; kesk, sor û zer pê ve daliqyabû, pirtûkek derxist û diyarî Doktor Sertaç kir. Doktor Sertaçê ko eslê wî ji Xarpêtê bû û ji malbata Şêx Seîd bû qet nedixwest xwe siyasî nîşan bide. Lê dîsa jî ji bo xatirê Perwînê ew pirtûk bi kêfxweşî girt, bi kêfxweşî spasên xwe jê re gotin, bi hev re derbasî odeya rûniştinê bûn û Doktor Sertaç ew li cihê herî xweş da rûniştandin.

Bi rûniştinê re wê çavên xwe li hundirê odeyê û li wêneyên dîwêr gerandin. Gava çavên wê li ser pirtûkxanê li wêneyekî Mustafa Kemal ket, hebekî ecêbmayî ma, lê dîsa jî ew ecêbmayîbûna xwe bi Doktor Sertaç neda xuyakirin. Wê Doktor Sertaç jî bi wê yekê hesiyabe, loma piştî bi nivsaetekê di nav sohbeteke li ser lingan, ew guldanka kirîstal a li ser pirtûkxanê bi dizîka kişande ber wî wênekê Atatürk ê biçûk. Ancax piştî demeke dirêj mamosta Perwîn ew yeka han ferq kiribû.

Sohbeta wan ya pêşî li ser nexweşxanê û doktoran, paşê jî dageryabûn ser dibistanê û rewşa mamosta û xwendevanan. Ne li ser sîstema nexweşxanê, ne jî li ser sîstema dibistanê Doktor Sertaç û mamosta Perwîn li hev nedikirin. Herweha wan li ser sîstema welêt jî li hev nedikirin. Mamosta Perwîn digot, divê partiyeke kurdî ava bibe û ew partiya kurdî bikaribe di parlemanto de doza mafê gelê kurd bike. Û wê digot, ji ber ko kurd bêtir bi rewşa xwe dizanin, ew ê baştir bikaribin pirsên xwe jî çareser bikin.

Doktor Sertaç li dijî wê nêrîna mamosta Perwîn derdiket û digot ger ji bo kurdan musade were dayîn ew ê sibe ereb jî, çerkez jî, asûrî ji, ermenî jî, gurcî jî doza vî mafî bikin û ger bi vî awayî here ew ê Tirkiye hilweşe û ew ê Cumhuriyeta ko li ser heqiyê ji aliyê Kemal Atatürk ve hatiye lidarxistin, nemîne û bi vê yekê ew ê tenê kêfa emperyalîstan were.

Carinan jê jî gava têdigihîşt ko mamosta Perwîn ji wan peyvên wî aciz dibe wî xwe hebekî nerm dikir, ji fikir û nêrînên xwe yên salan digeriya û pirrê caran mamosta Perwîn biheq didît. Û hema piştî wê jî jê re digot, bê ew çiqasî ji wê hez dike. Wê jî digot, ko tu niyeta wê û zewacê tune ye û ger di pêş de bizewice jî ew ê bixweze bi yekî ko nêrîna wî nêzîkî nêrîna wê ye re bizewice. Doktor Sertaç bi bergerîn digot ko erê ew niha wilo difikire, lê ew ê di pêş de nêrîna xwe biguhere û ew ê jî ji bo bi destxistina mafê gelê xwe têkoşînê bide.

Doktor Sertaç digot, ger ew bi hev re bizewicin wê bikaribin bi hev re xebateke zanistî bajon. Mamosta Perwîn jî jê re behsa wî mamosteyê fizîkê kiribû û gotibû, ew wê dixwaze, lê ji ber ko ew ji zewacê re ne hazir e, niha nikare bi kesî re bizewice. Ew ê dilxerabî bi Doktor Sertaç re çêbûbe, loma behsa wî mamosteyî kiribû û gotibû, wê rojê bi serxweşî ketibû hundirê pastexanê, ji hemû muşteriyan re xeber dabû, bi vê yeka han xortekî Siwêregî yê porxelekî ji cihê xwe pengizî bû û heta ko dev û pozê wî di xwînê de der kiribû, lê xistibû. Bi gotina Doktor Sertaç ko ne ji wî bûya, du xortên din jî xwe lê rakişandibûn, lê Dokto Sertaç û du hevalên xwe yên doktor nehiştibûn û heta yek ji wan bi wî mamosteyê fizîkê re çûbû malê jî. Mamosta Perwîn bi xwe bi wê pevçûnê hesiyabû, lê mamostê fizîkê bi awayekî din behs kiribû. Wî gotibû gava ew êvarî ji restorantê derdikeve, li kuçeya tarî du pêxwas riya wî dibirin, kêrê lê dikişînin û ji wî peran dixwazin. Gava momasta peran nade wan ew herdu pêxwas bi kulman lê dixin, lê tam di wê navê de sê mirovên navsal di wir re derbas dibin û bi zorê wî ji nav lepên wan derdixin û heta yek ji wan zilaman jî birîndar dibe.

Mamosta Perwîn ew mamosteyê fizîkê parastibû û gotibû ew qet bi wî şiklî venaxwe û ger vexwe jî ew tu carî serxweş nakeve û ger serxweş bikeve jî bi tenê dikene, hebekî zêde dipeyive û henekan dike. Bi van gotinên mamosta Perwînê, dilxerabî bi Doktor Sertaç re çêbû, piştî kêlîkekê dev avêt lixwekirin û meşa wî. Paşê ji mamosta Perwîn pirsî ka bê wê û wî mamosteyî tu caran bi hev re vexwarine an na. Mamosta Perwîn jî got ko bi tenê carekê di xelasoka dibistanê de hemû mamostan bi hev re şeveke


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

şahiyê çêkiribûn û wê jî hingî qedehek şereba sor vexwaribû.

Doktor Sertaç di wê navê de şûşeyeke wîskî ko ji çaran yekê wê vala bûbû ji bara xwe derxist û du qedehên kirîstal ên wîskî jî derxistin, qedehek dagirt, kirî ya din jî dagirta, lê mamosta Perwîn destê xwe da ber û got ko ew ji wîskiyê hez nake. Doktor Sertaç got, ger ew ji wîskiyê hez nake, şeraba sor û a spî jî heye, ger ew bixwaze ew dikare jê re qedehek şerab bîne. Mamoste Perwîn ji wê yekê re jî got, na û tenê qîma xwe bi hinek ava pirtûqalan anî û got, berî şev dereng bibe, divê ew here malê; ji ber ko wê hevaleke wê ya mamoste îşev were mêvandariya wê. Doktor Sertaç wê li ser hev vexwaribe loma hebekî serê wî xweş bûbû û du-sê caran jî li ser hev çû tualetê. Cara dawî ko ji tualetê vegeriya, li nêzîkî mamost Perwîn rûnişt. Mamosta Perwîn jî xwe kar kir ko here, lê Doktor Sertaç li ber geriya û xwest ew kêliyek din jî rûne. Di wê navê de jî Doktor Sertaç destê xwe dirêjî Mamoste Perwînê kir, destê xwe danî ser stûyê wê û jê re got, ko wî tu caran ji tu însanan ewqasî hez nekiriye. Mamosta Perwîn wek her car got, ko heya niha ew tu carî li zewacê nefikiriye û ger zewaceke wê hebe jî ew ê ancax di bîst û heft-heşt saliya xwe de bifikire. Doktor Sertaç jî gotibû, xem nake, em dikarin ji hev re soz bidin, dergistî bibin û heta êdî te dît wext e, wê çaxê em dikarin bizewicin. Gava wî ew gotinên han jî gotibûn, qirpika wî hilatibû, bêhna sîrê ya ko ji xwarina duh de mabû li ser çavên Perwînê ketibû. Ji bo Doktor Sertaç li ber xwe nekeve, Mamosta Perwîn berê xwe neguhertibû, lê piştî kurtedemekê, gava çavên wê li şûşeya wîskiyê ketibû, dîtibû ko şûşe li ber xelasbûnê ye. Wê Doktor Sertaç jî ew yeka han ferq kiribe, loma gotibû, ew ji wîskiyê pêve tu vexwarinên din venaxwe û gotibû vexwarina şerab û bîrayê bi tenê himaltî ye. Mamosta Perwîn jî gotibû, kultura wê ya vexwarinê hebekî kêm e û hema bi lez li saeta xwe nihêrî bû. Gava dîtibû ko saet nehê şevê derbas dike, destûra xwe xwestibû û her çiqas Doktor Sertaç li ber wê geriyabû jî dîsa ew rabûbû ser xwe. Li ber derî jî Doktor Sertaç bi bergerîna zarokekî li ber wê geriyabû û dîsa bê çawa ew ji wê hez dike, jê re li ser lingan behs kiribû. Carekê jî pişta xwe dabû derî, bi herdu destên xwe bi derî girtibû û xwestibû ji çûyîna mamosta Perwînê re bibe asteng. Di wê deqîqê de tirsek ecêb li mamosta Perwînê peyda bûbû, hema ji nişkê ve kiribû qîrîn, dehfek dabû Doktor Sertaç, derî vekiribû, di derencan de ji qatê pêncan bi bazdan daketibû jêr, di derketina avahiyê de li dergevan rast hatibû, lê li dergevan jî nesekinibû, derketibû der û bi gavên xurt lezandibû. Dergevan li wê rewşa wê ya bi kelecan ecêbmayî

mabû, lêva xwe berevajî kiribû, milên xwe hejandibûn û hêdî daketibû qatê avahiyê yê herî bin.

Doktor Sertaç jî li hundir, li ber derî, li ser zik dirêjkirî mabû, serê xwe xistibû nava herdu destên xwe û bi girîna zarokekî dikir îskîn. Car caran jî bi dengê hebekî bilind xwe bi xwe digot, »Kes ji min hez nake, ez ne spehî me, Perwiîîn… ez ji te hez dikim!…«


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Heyştê adarê

Di heştê Adara 1982an de, li komelê, di civîna di derheqê jinan de Mamosta Çetîn destûra peyvê xwestibû û bi germî dipeyivî:

— Gelî hevalan, ez ê li vir zêde behsa problemên jinên dinyayê nekim. Qesta min ne ew e ko problemên jinên dinyayê tune. Belê, hene... Bi hezeran e... Problemên jinên ewrûpiyan jî hene. Ew jî bindest in, ew jî tên mêtin. Lê ji ber ko di vir de armanca min jinên kurdan e ez ê nexwazim dûr û dirêj behsa jinên dinyayê û problemên wan bikim. Erê hevalno! Wek hûn dizanin, jinên kurdan bindest in. Ew hem cinsî, hem neteweyî, hem jî sinifî bindest in. Civata me civateke paşdemayî ye, civateke xwedî gelek bermayên feodalî ye. Di vê civata paşdemayî de, di vê civata nexweş û bi sinif û bi berberî de jinên me yên xweşik û spehî di bin êş û zilmeke dijwar de dinalin. Ew weke heywanan tên kirîn û firotin. Ji wan re evîn tune ye, xweşî tune ye, jiyan tune ye. Ew kole ne, hevalno! Ew bindest in! Divê em xwendevan û ronakbîrên kurd li jinên xwe xwedî derkevin. Em keçên xwe bidin xwendin, em wan bigihînin, jinên zana ji wan derxînin. Em keçên xwe bi dilê wan bidin. Em jinên xwe bi xwe re bibin komeleyan, civînan, civatan, dîlanan. Em wan bibin şev û şahiyan. Bila jinên me bixwînin, nûjen bibin. Gelî hevalan, bi kurtî, divê jinên me serbest û azad bibin!

Mamosta Çetîn bi van gotinan dawiya peyva xwe anî, ji bo destûra peyvê spasên xwe ji serokê civînê re got, ew gulpa qehwê ya sar, ko berî bi nîvsaetê di binê fîncana wî de mabû, bi hêdîka, bêî ko firrîniyê jê bîne, vexwar û çavên xwe bera sernaveke rojnama ko li ser masê bû da û bêdeng ma.

Nêzîkî sih kesan beşdarî civînê bûbûn. Ji wan sih kesan bi tenê yek jin bû. Xuyabû peyva mamosta Çetîn baş tesîr li jinikê kiribû. Wê bi hêdîka, bêî ko haya kesî bigihînê, bi destmalka xwe ya kaxizî hêsirên xwe pakij dikir.

Piştî mamosta Çetîn, yekî din jî destûra peyvê xwest, bi kurtî behsa dîroka heyştê adarê, tevgerên jinan, behsa rola jinan di têkoşîna sinifa

karker de, behsa feminîzmê û behsa ko çawa jinên kurd perçeyek ji tevgera jinên cîhanê ne, kir.

Civîna wan kurt, lê germ, bi munaqeşeyan ve tijî û bi serfirazî dawî hat. Mirov ev yeka han, piştî civînê ji rewşa beşdarên civînê jî ferq dikir.

Mamosta Çetîn piştî civînê jî bi du hevalên xwe re çû bîraxaneyekê û her yekî ji wan bîrayek du bîra jî vexwarin. Ew derengê şevê, saet li dor yanzdeh û nîvan çû malê. Digel ko mifta wî hebû jî, dîsa wî weke hertim li zengilê derî xist û li benda vekirina derî rawestiya. Di lêdana cara pêşî de gava derî venebû, mamosta Çetîn carek du carên din jî li derî da. Bi lêdana sisê an çaran re, jina wî çavlixew û bi kirasê şevê li wî derî vekir.

Bi vekirina derî re mamosta Çetîn bi dengekî bilind bi ser de qîriya:

— Ma qey heta ez bîst carî li derî nedim tu derî venakî?

— Deng nedihat min, jinikê bi çavlixewî got.

— Deng nayê te ne wilo? wî bi hêrs pirsî. Ger dengê Gulê bûya wê bihata te!

Gulê hevaleke jina wî bû. Ji ber ko ji eynî bajarî bûn û li welêt jî cîranên hevdu bûn, wan car caran hevdu didîtin.

Mamosta bi van hevdudîtinên wan aciz dibû. Sedema acizbûna xwe jî bi nebaşbûna Gulê ve girê dida.

— Çi ye, te xêr e dîsa? jinikê got.

Mamosta Çetîn çakêtê ko ji xwe kiribû dirêjî wê kir û bi hêrs,

— Hişş, dîsa devê te vebû, got, derbasî metbaxê bû û li herdu beroşên li ser ocaxê nihêrî. Gava ew xwarina ji firavînê de mabû, dît, bi dengekî bilind got:

— Êdî te dev ji çêkirina xwarinê jî berdaye, tu bûyî xanim!

— Ne te got, ez îşev nayêm şîvê, ez ê dereng werim malê. Xwarina me jî hebû, min got heyf e ko ez vê xwarinê hemûyî birijînim û xwarineke nû çêbikim.

Mamosta Çetîn li ser lingan, hema wilo bi sarî çend kevçî jê xwarin û li ser kursiyeke ber masa metbaxê rûnişt.

Jina wî jî, digel ko ew ji xewa gêj bûbû, li ba wî rûnişt.

— Rabe ji min re çayekê çêbike, mamosta bêî ko lê binihêre got.

Jinik rabû ser xwe, çaydan nêvî av kir, danî ser ocaxê û dîsa hat li ba wî rûnişt.

— Pir kes hatibûn civînê? jinikê jê pirsî.

— Erê, pir bûn, mamosta bêî dilê xwe bersiv da.

— Jin jî hebûn?


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Erê, tenê tu kêm bû (!)

— Ev te xêr e îşev?

— Min xêr e? Êdî tu ne xwarinekê çêdikî, ne kincekî dişoyî, ne malê paqij dikî! Tu ancax bi Gulê re rûnî û paşgotiniyan bikî. Binihêre! Careke din jî tu bêî xebera min neçî cihekî!…

Jinikê tu mane ji wan gotinên wî re nedît. Rabû ser xwe, jê re çaya wî dem kir, danî ber wî û xwest ko here ji xwe re razê.

## Stêrkek ji ezmanê me xuricî

Piştî programeke televizyonê, ez bi cangiranî bi mêrdewanê ve bi jor ketim û çûm ser xênî. Yek ji tiştên ko min deh salan li Ewrûpayê hesreta wê kişandibû jî, razana li ser bana bû. Min gelekî ji razana li ser bên hez dikir û her êvar heta bi nîvê şevê min xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, destên xwe dixistin bin serê xwe û min li stêrkên ezmanê welêt dinihêrî. Wê şevê jî min wilo kir. Bêî ko ez kincên xwe ji xwe bikim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, destên xwe xistin bin serê xwe û di bin bayê payizê yê sivik û hênik de li stêrkên ezmên nihêrî. Gelo berê jî ezmanê welêt bi ewçend stêrik bû? Çiqas stêrkin xweşik, çiqas diçirisîn. Ez di wê navê de li Leyla û Mêcnûn fikirîm, min ew jî dîtin. Min çavên xwe li riya Kadizê gerand, min ew jî dît. Min demeke dirêj bala xwe berda Leyla û Mêcnûn û ez li benda ramûsandina wan rawestiyam. Min ramûsandina wan bidîta, min ê ji xwe re tiştin bixwesta, tiştin hêvî bikira. Qet nebe me bi zaroktî wilo bawer dikir. Em heta bi derengê şevê li benda ramûsandina wan diman û em wilo di xew re diçûn. Tiştê ecêb, gava ez li wan rojên xwe yên zaroktiyê difikirîm, min xwe mîna zarokan hîs dikir. Şewqa stêrkên ezmên ez dibirim salên min yên zaroktiyê. Di salên xwe yên zaroktiyê de ez heyrana şewqa elektirîkên bajarê Mêrdînê bûm. Nizanim gelo we tu carî bi şev di nêzîkî Mêrdînê re rêwîtî kiriye? Şewqa elektirîkên bajêr wilo germ, wilo dostane ye, bajar ewçend bilind e ko mirov dibêje qey ew bi stêrkên li ezmên re qayişê dikişîne. Ez di xeyalan de kûr çûbûm. Ez li ezmanê ewqas bilind û bêstûn ecêbmayî mabûm. Di wê navê de ne ji dengê diya min bûya, belkî ez bi saetan ji xeyalên xwe venegeriyama jiyana rastî.

— Ma tu firrek çeqilmast venexwî lawê min?

Ez bi dengê diya xwe veciniqîbûm, min ew tasa çeqilmêst a ko hîn qeşa wê neheliyabû ji destê wê girtibû, çend gulp jê vexwaribûn, min paşê ew tas danîbû ser pirêketekî li ber serê xwe, min dîsa xwe li ser piştê dirêj kiribû û li ezmanê bê ser û bin û li stêrkên bi şewq û rohnî nihêribû. Û ez

wilo di xew re çûbûm. Lê ez nizanim çiqas tê de çûbû, ez bi dengê teqîneke ko bêdengî û kerrîtiya şevê çirand ve şiyar bûm. Bi şiyarbûnê re min dît ko ew stêrka li nêzîkî Leyla û Mêcnûn rijiya erdê.

* * *

Sibehê zû li mala cîranê me dengên lîlandin û çepikan dihat. Min ji diya xwe pirsî, wê got: »Stêrkek ji ezmanê me xuricî, keçika cîrana me ya berzewacê şehîd ket«.

Her ko roj bilindtir dibû, dengên lîlandin û çepikan zêdetir dibûn.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Xewna Orhanow

Piştî mayîna deh salan ya li Swêdê, Orhan biryara xwe da ko seriyekî here welêt.

— Ez çûyina xwe ji tu kesî re nabêjim, wî xwe bi xwe got. Ne ji hevalên vir re, ne jî ji malê re. Ger ez ji Serdar re bibêjim, ew ê ji her kesî re bibêje, ew bi devê xwe nikare. Ez nabêjim. Ez zanim ew ê dilê xwe bigire, lê tişt nabe, ez ê dîsa dilê wî xweş bikim.

Piştî bi du rojan wî firaxên xwe xistin hev, baholek tijî kinc û diyarî kir; lê ji nişkê ve ramanek hatiyê.

— Na, got, ez tu tiştî bi xwe re nabim. Ez ê destvala herim. Tew nebe ez ê li Tirkiyeyê diyariyan bikirim. Oooxx... Wê çiqas xweş bibe. Azadê birayê min çav li min bikeve, ew ê ji dûr ve baz de pêşiya min û mizgîniyê bide diya min. Lê niha bênamûso mezin bûye. Erê, erê, ew mezin bûye... Ma ne bavê min carekê di nameyeke xwe de nivîsandibû û gotibû: »Azad êdî mezin bûye, porê xwe şeh dike û ji keçikan re difikîne«. Haa!...Ya baş ew e ez bi şev herim, bê ko kes min bibînin. Ez ê hêdî herim ber derî û li der bixim. »Kî ye?« Wê diya min bi dengê xwe yê zirav bipirse. Lê ez ê dengê xwe biguherim; ez ê bi dengekî qalind bibêjim: »Derî vekin!«. »Tu kî yî?« wê diya min bipirse. Ez ê îcar dengê xwe zirav bikim, »Derî vekin, zû!«. Wê birayê min Xelîl ji nav nivînê xwe bipeke û pirtûkên xwe di nava kîsên genim de veşêre û wê diya min bibêje: »Lawê min ne li mal e, em cihê wî nizanin!« Hingî ez ê bibêjim: »Dayê, ez im, derî vekin!« Wê birayê min yê navê bi dengekî nizim bibêje: »Derî venekin, esker in, derewan dikin.« Derî vekin« ez ê bibêjim dîsa. Bavê min wê bibêje: »Weleh ev dengê Orhan e.« Wê giş bi hev re baz bidin û derî vekin. Hingî ditirsim dilê diya min bisekine. Na, na, ez wilo naçim. Ya baş ew e ko ez bi roj herim malê. Dibêjin muxbir pir bûne, ma kî ê min nas bike? Ev deh salên min in ko ez ji welêt derketime. Hingî ne riha min, ne jî simbêlê min hebûn. Niha ez hatime guhertin; rih û simbêlê min şîn hatine û cênîkên min spî bûne.

Hîn wilo, çend caran li deriyê wî ket. Wî zû bi zû bahola xwe xist

dolabê, bilêta xwe ya balafirê ji ser masê hilanî, xist bêrîka xwe; baz da û derî vekir.

Serdar ket hundir.

— Oo, Serdar bi devkenî got. Ev çi kinc in te li xwe kirine? Tu ê herî konferansan an herî ba keçik meçikan?

…

Ew bi hev re derbasî hundir bûn û heryekî cigareyek vêxistin.

— Weleh êdî ez aciz bûme, Serdar bi derd got. Ev deh salên me ne ko em li vî welatî ne, ka me çi ji xwe fêhm kir?

— Va ye ez diçim, Orhan got. Ez ê herim mala we jî.

— Tu ê herî ku?

— Ez ê herim welêt.

— Eh, çawa ko ez diçim, tu ê jî wilo biçî.

— Weleh ez ê herim.

— Loo, de tu dev ji van haweyan berde. Ma tu ê min bixapînî.

— Ê baş e, tu bawer neke.

— Ji te weye ez bawer dikim?

— Tu zanî, dixwazî bawer bike, dixwazî bawer neke.

— De tu dev ji van haweyan berde, Serdar dîsa got.

Orhan bilêta xwe ya balafirê derxist û nîşanî wî da:

— Tu îcar bawer dikî?

Serdar bilêt ji dest girt û lê nihêrî:

— Tu dikî bi rastî jî herî?

— Erê, piştî nîvsaeta din divê ez herim. An na ez ê ji balafirê bimînim.

— Ma haya malê ji çûyina te heye?

— Na, min ji kesî re negotiye. Min ji te re jî nedigot, lê tişt nabe, em hevalên hev in.

Bîskê li ser dûriyê, li ser keçikan û li ser siyasetê peyivîn. Dû re Serdar hin tembîh lê kirin û bi hev re çûn balafirgehê.

Berî ko Orhan li balafirê siwar bibe, Serdar got:

— Wî tiştê ko min ji te re got, tu ji bîra nekî ha!

Herdu hevalan destên xwe ji hev re hejandin û Orhan bi hewa ket û çû.

* * *

Çaxa ew li balafirgeha Stembolê peya bû, kal û pîrek û sê xort hatin pêşiya wî. Pîrê xwe avêtiyê û bi girî got:

— Ooxx... şukur, tu hatî lawê min. Maşale, maşale, lawê min bûye mîna şêrekî.

Dû re peyayê kal û hersê xortan xwe avêtinê.

— Ooh Gud, vi trodde aldrig att vi skulle träffa dig igen,[1] peyayê kal got.

Ew dê û bavê wî û hersê birayên wî bûn.

— We ji ko zanî bû ez ê îro werim? Orhan bi ecêbmayî pirsî.

— Vi visste, bavê wî got. Vi vet allt. Det är Gud som meddelar oss? [2]

— Tu ji ko hînî swêdî bû yî? Orhan bi şaşmayî jê pirsî.

— Hemma pratar vi svenska,[3] diya wî got.

Bavê wî yekî bejinkurt bû. Porê xwe yê spî li ser piştê şeh kiribû. Berçavkeke doxdarînî û hebekî reş li ber çavan bû û her dikeniya. Diya wî bi du tiliyan bi ser bavê wî diket. Berî ko Orhan ji welêt derkeve, diya wî sernixumandî bû. Lê niha tu tişt li serî tune bû; serqot bû. Kirasekî kurt û vezelekî milkurt lê bû, zeyif bûbû û herdu gepên wê kort çûbûn. Ne dê û ne jî bavê wî ko ne ji lixwekirina wan bûna, ew zêde nehatibûn guhertin. Lê birayên wî? Orhan bi tenê yê mezin nas kir. Ger birayê wî yê mezin resimê xwe jê re neşandibûya, wî ê ew jî nas nekira.

Hersê bira jî bi ser wî diketin. Yê biçûk ji herduyên din dirêjtir bûbû. Bejna wî zirav bû û qatek kincên reş lê bû. Herduyên din jî her yekî qatek kincên spî lê bûn û solên rengo mengo di lingên wan de bûn.

— Êê, we ji ko zanîbû ez ê îro werim? Orhan bi dengekî nîvgirî û bi hêvî pirsî.

— Me zanî bû, me zanî bû, bavê wî got. Erê tu ji Xwedê bawer nakî, lê wî ji me re got.

Dîsa wan yek bi yek Orhan hembêz kirin.

— De em herin, bavê wî got, ancax em bigihîjin ser otobusê.

Hemû bi hev re ber bi termînala otobusê ve meşiyan; li otobusê siwar bûn û berên xwe dane Diyarbekirê.

Di rê de diya wî ji aliyekî, bavê wî ji aliyekî û birayên wî ji aliyekî ve di pencereyên otobusê de bi destan der û dor nîşan didan û digotin: .

— Binihêre, me ji te re dinivîsand û digot, welatê me xweş bûye, bûye cenet, te bawer nedikir. Esker mesker nemane, polîs nemane, tu kes hevdu nakujin, herkes ji hev hez dikin. Ma ne te jî wisa dixwest? Binihêre, binihêre bê çiqas xweş bûye.

— Erê Wele, Orhan got. Welatê me ji Swêdê jî xweştir bûye.

— Lo lo! Tew tu bajarê me bibînî!

Saet nehê êvarê otobusa wan li bajarekî sekinî. Bajar wêran bû û xaniyên bajêr yên bilind ji şûna gulleyan bûbûn weke seradê.

— Ev e bajarê me yê weke cenetê? Orhan bêhêvî pirsî.

Bavê wî,

— Na lawê min, got. Ev Bêrûdê ye, Lubnanê... Xelk li vir hevdu dixwin, herkes bi hev ketine, herkes hevdu dikujin. Ev jehrtêketiya Bêrûdê ye!

Orhan şaş û ecêbmayî mabû:

— Ger ev Bêrûdê be çima otobusa me di vir re diçe?

— Ew çîrokeke dûr û dirêj e, lawê min. Bi xêr ko em bigihîjin malê ez ê ji te re bibêjim.

Otobusa wan gihîşt Diyarbekirê. Çaxa ew ji otubusê peya bûn û ber bi malê ve meşiyan, bavê wî got:

— Me ji te re negot ko bajarê me bûye cenet. Binihêre, ma ne weke cenetê ye?

Bi rastî jî bajar mîna buhuştê bû. Bedena wê ji nû ve hatibû lêkirin, hemû xanî spî bûn û her der hêşnayî bû. Mirov, dikan, otomobîl, hema her tişt hatibûn guhertin.

Birayê wî yê biçûk got:

— Te ji me bawer nedikir. Ka polîs? Ka esker? Ew çûn, dema wan çû. Dewleta wan jî çû… Em niha xwe bi xwe ne, em bi xwe dewlet in.

Ji bo Orhan sê rojan li def û zurnê ket, berx û beran hatin serjêkirin û şekir li zarokan hatin belavkirin. Roja çaran çar peyayên bejindirêj û bi navmil hatin mala bavê Orhan û bixêrhatinî dane Orhan. Piştî ko rûniştin, yekî ji wan got:

— Em endamên hukûmeta Kurdistanê ne û me bihîstiye ko te li Swêdê ekonomî xwendiye, ji ber vê yekê em dixwazin tu jî di hukûmeta me de cih bigirî.

Hîn berî ko Orhan bersivê bide, lawikek bi bayê bezê ket hundir û bi heyecan got:

— Apê Orhan, baz de, xwe veşêre, esker hatin.

Hîn peyva lêwik di dêv de bû, li telefonê ket. Lê kesî bersiv neda. Telefonê her dikir zire zir. Orhan rabû ser xwe ko baz bide, ew her çar peya jî rabûn û nasnavên xwe nîşanî wî dan,

— Em polis in, gotin, tu çûyî Swêdê û tu li dijî dewleta me xebitî yî. Bide pêşiya me!

* * *

Hingî Orhan ji xew hol bû, di karyole wer bûbû, li ser wê erda sar dîsa laşê wî di xwêdanê de mabû. Saeta wî jî her dikire zire zir. Saet li ser heftê sibehê lêdixist. Wî bi hêrs destê xwe li saetê xist û axînek kûr kişand. Rabû ser xwe û çû daşirê. Piştî bîskekê posta wî hat. Du name, dîploma wî ya ekonomî, kovarek û du rojname jê re hatin. Yek ji wan nameyan jê re ji malê hatibû. Wî bi lez ew name vekir û xwend. Gava di nameyê de bihîst ko birayê wî hatiye berdan, kêfa wî hat, bi lez kincên xwe li xwe kirin û çû mala Serdar. Serdar hê di xew de bû, bi tena derpîkê kinik jê re derî vekir.

— Çi ye, te xêr e vê sibehê? Serdar jê pirsî.

— Tu dizanî Serdar...

— Ez çi dizanim? Te dîsa xewnin ditîne?

Orhan keniya:

— Erê.

Serdar jî bi ken got:

— Wele tu li me bûyî Oblomov. Dawiya xewnên te nayên bavo. Xêra xwedê yek derketa, xewnên te binivîsandina û navê pirtûka xwe jî bikira »Xewnên Orhanov«. Êê, de ka bêje, tu dîsa dibûyî serokwezîrê Kurdistanê, an wezîrê kulturê?

Orhan keniya. Ew bi hev re derbasî mitfaxê bûn û ji xwe re taştê çêkirin. Heya derengê rojê ew li ser xewna Orhan, li ser rewşa xwe ya li Ewrûpayê û li ser rewşa welêt peyivîn.

(1) Oo Xwedêyo. Me qet bawer nedikir ko em ê careke din te bibînin.

(2) Me zanîbû. Em bi her tiştî dizanin. Xwedê haya me digihînê.

(3) Li malê em bi Swêdî dipeyivin.

## Kêzika bênav

Piştî rêwîtiyeke dirêj ez ji Şamê gihîştim Qamîşlokê. Ji bêxewiyê û ji guhertina hewa û xwarinê ez gêj bûbûm. Wê êvarê, her çiqas hin malbatên kurdan nexwestin ez herim hotêlê û bi çûyina min ya hotêlê dilê xwe girtin jî, dîsa min bi ya xwe kir; ji bo rehetiya xwe û bi fikira ko ez ê her roj bikaribim serê xwe bişom, ez çûm hotêlê.

Qaşo hotel luks bû. Ji xwe gava mirov ji derve li avahiya hotêlê dinihêrî, hotel gelekî xweş û luks xuya dikir. Li gora hotêleke Rojhilata Navîn û bajareki piçûk, ger em paqijiyê deynin aliyekî, hêwana wê jî ne xerab bû. Nizanim çima, lê dibe ji ber ko ez biyanî bûm û xwediyê paseporteke Swêdî bûm, ne şagirtên hotêlê, lê xwediyê wê bi xwe bi min re mijûl dibû.

Gava mêrik odeya min û nivînê ko ez ê tê de razêm nîşanî min da, galonekî mazotê jî anî û ji min re sobe dada.

— Swêd sar e, lê şevên biharan welatê me jî sar e, bi ken got, şevbaşî da min û derket.

Ez demekê wilo bêdeng li ser nivînê xwe rûniştim û min çavên xwe li hundirê odê gerand. Ji serşuştin û razanê pêve tu tişt nedihate bîra min. Ji ber ko min dizanîbû wê saetê ava germ peyda nabe, di destên min de bi tenê razan mabû. Her çiqas pakbûna nivîna ne bi dilê min bû jî, min kincên xwe ji xwe kirin, lampa xwe vemirand û hêdî ketim nava nivînê xwe. Hema ko ez xilmaş bûm dengê xişxişekê hat min. Bi bihîstina deng re min bi hêz serê xwe ji ser bahlifê rakir, guhên xwe miç kirin û li wî dengî guhdarî kir. Îcar ne bi tenê dengê xişxişê, her wisa dengê çîzeçîzekê jî hat min. Ez bi xwe ji kurmik û kêzikan ditirsim, an jî ez ji wan zehf aciz im, loma ez ji nav nivîna pekiyam û min zû lampe pêxist. Çer ko min lampe pêxist, min dît ko tiştek bilez ket qelîşteka dîwêr. Demeke dirêj sola min di destê min de bû û ez li benda wî tiştî rawestiyam. Di wê navberê de jî ji bo ko ez bê tirs bikaribim razêm, min di serê xwe de plana ko ez ê çawa û bi çi awayî bikaribim wî benderuhî bikujim, çêdikir. Ez demeke dirêj li benda mam, lê ew derneket. Ez weha westiyabûm, ko êdî nikarîbûm li ser lingan rawestiyama. Min sola di destê xwe de danî û bêî

ko lampê vemirînim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir.

Bi xişexiş û çîzeçizeke din, min dît ko kêzikek mezin ji qelîşteka dîwêr derket û bi dîwêr ve rapelikî. Erê, bawer bikin min kêzikeke wilo qet nedîtibû. Herdu çavên wê sor wek du bizotên êgir bûn. Pozê wê reş û deqeke spî lê bû. Serê wê mîna serê mûrîyekê biçûk bû; lingên wê baş nedihatin xuyakirin, lê ji çaran zêdetir bûn. Gava diçû ber zikê odê rengê wê kesk dibû, ko xwe berdida jêr rengê wê dihat guhertin, sorereş dibû.

Min jî xwe li ser nivînê xwe dirêj kiribû, herdu destên xwe xistibûn bin serê xwe û li wê kêzikê temaşe dikir. Te digot qey ew bi min re ketibû qayişê, ez hêrs dikirim. Carinan bi lez bi dîwêr ve radipelikî, diçû ber zikê odê, demekê li wir radiwestiya, bi çavên xwe yên sor li min mêze dikir, serê xwe çend caran dihejand û dû re bi lez xwe berdida jêr. Na, diviyabû ew kêzik wê şevê bihata kuştin, an na xew li min tunebû. Ez dîsa weke berê bi lez ji nav nivîna pekiyam, min rahişt sola xwe ko biavêjimê, lê kêzikê çivek da xwe û dîsa ket qelîşteka dîwêr. Ta ko ez li ser lingan bûm ew derneket, lê gava min xwe li ser nivîna dirêj kir, ew dîsa derket û dîsa weke berê bi jêr û jorê dîwêr ve çû û hat. »Ya Rebî ez ê çi bikim?« min di dilê xwe de got. Tu nabêjî westandinê zora min biribû û hema ez bi wî awayî di xew re çûbûm.

Min xewneke ecêb di xew de didît. Di şerekî nenas de, hevalên min hemû şehîd ketibûn. Ez jî birîndar bûbûm û di nava xwînê de vedigevizîm. Bi wê birîna xwe ya xedar, bi rik û hêrseke ecêb min xwe ji ber dijmin dida alî û ez bi çiyê ve radipelikîm. Ji bo ko ez xwe nedim dest û şopê ji ser xwe winda bikim, min xwe davêt şikeftekê. Şikeft teng û tarî bû. Di wê şikefta teng û tarî de, ji nişkê ve marekî stûr û bi quloç êrîş tanî min. Demeke dirêj min û mêr li ber hev dida. Geh wî li min dixist ez bi çend gavan bi paş de dipengizandim, geh min lê dixist ew bi çend gavan bi şûn de dişand.

Dawî dawî min bi hêz destek lê xist û ez bi êşeke giran ji xew şiyar bûm. Gava ez rabûm, ez di xwêdanê de mabûm. Her du çongên min dihejiyan û xureke ecêb laşê min girtibû. Min kir û nekir çavê min yê çepê venebû. Gava min destê xwe danî ser, min hîs kir ko weke hêkekê werimî ye û tiştek pê ve zeliqî ye. Min ew tişt bi neynûkan da alî û bi çavê rastê baş lê nihêrî; min dît ko kêzika min e.

Ez hingî têgihîştim ko min di xew de destê xwe li ser çavê xwe xistiye û kêzik kuştiye.

Ji wê rojê pê ve ez neçûm hotêlê û heya bi hefteyekê bi zor werimandi-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

na çavê min daket.

Lê navê kêzikê ji min re bû meraq. Min ji kîjan xelkê Qamîşlokê, gundiyên der û dora Qamîşlokê, kurdên Şam û Helebê pirsî û kêzik ji wan re tarîf kir jî, her gotin:

— Xeyo, welle em nizanin.